geydilər, başlarına kapora oxşayan papaq qoydular, sürmələndilər və kişilərlə növbələşib düzülərək böyük həvəslə axşama qədər öz ağır ayaqlarını yerə döyərək oynadılar. Kürdlərdə, şübhəsiz ki, qadının öz fərdiyyəti vardır. Məs, ağılı və gözəlliyi ilə fərqlənən ananın adı oğlunun adının yanında yazılması əsassız deyildir. Mən hər hansı bir «Bapiri Şaşan», yəni Şaşanın oğlu Bapir anasının şöhrətini hər yana yayır. Qadının qəbilə başçısı olması, qəbiləni tamamilə ona tabe olmasına aid çox misallar çəkmək olar. Məsələn, məlumdur ki, Həkəri türklər tərəfindən tamamilə tutulanda dairə qadın tərəfindən idarə olunurdu. (Hartman) Süleymani yaxınlığında kiçik Hələbçə şəhərində bizə 1914-cü ildə Osman paşa Cafın dul qadını məşhur Adilə xanımı görmək qismət oldu. Bir neçə il bundan əvvəl o, faktiki olaraq bütün dairənin müdiri idi. Bu iş türklər tərəfindən nominal olaraq onunərinə tapşırılmışdı, o isə heç vaxt öz yerində olmurdu. Soan fars taciri adı altında bir müddət onun kiçik həyətində yaşamış və onun öz təbəələrini idarə etmək, mühakimə etmək və bu zaman cürbəcür parçaların alınması, ev təsərrüfatının idarə olunması kimi qadın işlərini unutmamasını olduqca maraqla təsvir etmişdir. İndi Gənc Türklər hökuməti Hələbçəyə əsl türk məmuru göndərib və Adilə xanım istifadə bir qədər etibardan (gözdən) düşmüş kimi yaşayır. O, özünü böyük ləyaqətlə aparır. O, bizim düşərgəyə bir yığın gəlinin və qul-

sual, nə bir yersiz, istehzalı gülüş. Hamısı yeni həyatərzinə maraqla baxırdılar. Verdiyimiz yeməyi qəbul edirdilər və tam inamla öz işlərindən danışdırlar.

Kürdlər, ümumiyyətlə uşağsevəndirlər. Hər bir başçının yanında onuncu, ya on ikinci oğlu – sevimli pintibalası qurdalanır. Çox vaxt dağlarda igid bir kürdü qocalığın ümidini qucağına almış görürsən. Mənim qabaqkı səfərlərimdən bir səhnə yadıma düşür. Bir dəfə bizim karvanımız uçurumun üstündəki dar yolla gedirdi. Birdən dağları arxasından bizim üstü müzfəki keçici cığırında iki adam gördü. Qabaqda yüngül geyinmiş kürd, görünür yoxsul kəndlidir, qucağında əski-üsküyə bükülü xəstə uşağı gətirir. Ardınca ərinin yükünü yüngülləşdirmək üçün onun xəncərini götürmüş mehriban, ancaq qüssəli sifətli arvadı gəlirdi. Aydın oldu ki, uşaq damın üstündən yıxılıb və özündən gedib. Valideynlər onu qonşuluqda yaşayan ara həkiminə göstərməyə tələsirdilər. Şərqdə həkim kimi tanınmış avropalıları görəndə kimisi ana atın yüyənindən yapışib ayaqlarından öpməyə başladı ki, onun uşağını xilas etsinlər. Bu səhnədə çoxlu səmimiyyət və cansız dərddə vardı. Antiteza kimi yadıma kürdlərin təhlükəyə, ölümə nifrəti və bir kürd başçısının «Ancaq öz yatağında ölmək biabırçılıqdır. Əgər mənə güllə dəyər, və mənə evə gətirsələr, hamı sevinəcək ki, mən necə lazımsa ölmüşəm.» Bəlkə də bu sərt fəlsəfəyə kürd anaları da şərikdirlər. Ancaq bədbəxt qadının dərdi onların



luçuları ilə gəlmişdi. Və həvəslə şəklini çəkdirməyə razılıq verdi. Oğluna verilmiş hədiyyəyə görə təşəkkürünü fransızca yazılmış məktubla bildirmişdi. Sonra məlum oldu ki, məktubu Sennə şəhərində katolik missionerindən fransız dilini öyrənmiş gənc bir kürd yazmışdı. Bizim ekspedisiyanın yeganə avropalı xanımına Hələbcədə yaşayan qadınların son dərəcə diqqət göstərməsi, faktı yəqin ki, Adilə xanımın qadın adını yüksək tutması ilə izah olunur. Gələn xanıma baxmaq üçün qarşımıza çoxları çıxmışdı. Sonra qatıq, tut, yumurta və s. ibarət təbrik hədiyyələri ilə, dəstə ilə görüşə gəlib çadırımızı əhatə edənlərin əlindən macal yox idi. Bu zaman bizim qonaqların əxlaqı, tərbiyəsi qəribə idi. Nə bir kobud

qəlbinin daha zərif telləri barədə inandırıcı təsəvvür yaradırdı.

Bir çox qəbilələrə bölünmüş, müxtəlif coğrafi şəraitlərdə yaşayan, yüksək mədəniyyətin səviyyəsinə çatmayan, cılızlanmış nəhayət, demək olar ki, öyrənilməmiş bir xalqın xarakteri haqqında tam və ətraflı təsəvvür yaratmaq mümkün deyil. Bütün bu deyilənlərə ayrı, ya başqa xalqlarla, xüsusilə, xristianlarla bir yerdə yaşamaqdan asılı olaraq kürdlərin xarakterindəki bəzi fərqləri də əlavə etmək mümkündür. Hamını eyni həyat şəraiti birləşdirən yerdə, hətta dövlət hakimiyyəti olmasa da bəzi qaydaya oxşarlıq yaranır. Süleymani, Sour-bulaq və b. Şəhərlərdə kürdlər daha yaraşlıqlı olurlar.

Ardı var

Kürt ve Kürdüstan tarihinin kaynakları

Kürtlerin 3 bin yıllık tarihi kesintisiz olarak tarih kitaplarında yer alıyor. Selahaddin El-Kurdî Kürt Tarihini, kaynak taraması yaparak güzel bir araştırma sunuyor. El-Kurdî, "ilk başta Kürt kaynakları, ardından da bütün bu çalışmalardan yararlanılarak Kürt Tarihi'nin yazılması gerektiği ortadadır" diyor.

Selahaddin El-Kurdî / Arşiv

Tarihsel süreçte Kürtlerle iletişime geçmiş olan milletlerin, Kürtlere dair, fikirleri, yorumları, bilgileri; kendi tarih, coğrafya, seyahatname, ansiklopedi vb. eserlerine yansımıştır. Sümer (M.Ö. 2000), Akad ve Asur tabletleri sayılmazsa, kağıda dayalı en eski belgelerden olan Herodot'un (M.Ö. 484-425) "Tarih" eserinden başlayarak farklı zaman, zemin ve dillerde hazırlanmış olan eserlerde Kürt ve Kürdüstan'a dair bilgilere yer verilmiştir. Bu çalışmada, M.Ö. 5. asırdan başlayarak, tarihsel çizgi dikkate alınarak Eski Yunanca, Grekçe, Süryanice, Ermenice, Pehlewice, İbranice, Arapça, Farsça, Osmanlıca, İngilizce, Fransızca, İtalyanca, Almanca, Rusça kaynaklarda 'Kürt ve Kürdüstan'a dair bilgilerin bulunduğu işaret edilmiş, kimi eserlerden alıntılar yapılmış, kimi eserin ise sadece ismine yer verilerek araştırmacıların dikkatlerine sunulmuştur.

Kürtler için kullanılan tabirler

Dr. Asad Khailany'nin araştırmasına göre tarihsel süreçte Kürdler için Sümerler "Karda, Kurti, Gutî", Babiller "Garda, Karda", Asuriler "Qurti, Gutî", Grekler "Kardukh, Gordukh", Ermeniler "Kortukh, Gortaikh", Persler "Gurd, Kurd", Süryaniler "Karda, Kurdaye", İbraniler ve Keldaniler "Kurdaye", Aramaik ve Nasturiler "Kadu", Erken Dönem Arap kaynakları "Kurd, Ekrad", Avrupalılar M.S. 7. yüzyıldan itibaren "Kurd" kavramını kullanmışlardır. G.R. Driver, 1923 yılında yazmış olduğu "The Name Kurd and Its Philological Connexion (Journal of the Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland, No:3, 1923, ss:393-403)" isimli makalesinde, yazıtlardan hareketle farklı dillerle ifade edilmiş olan "Kurti, Karda, Karduk, Gord, Kord, Cardakes, Cyrtii vb" biçimlerinin 'krd/kr't kökünden türediğini ve Kürtleri kastettiğini söylemiştir.

Hrozny'nin "History Et Progres De Dechiffrement Des Textes (Archiv Orientalni, Vol:3, no:1, 1931, s:286)" araştırmasına göre ise Kürt yurdu için kullanılan en eski coğrafi isim 'Karda' olup M.Ö. III. bin yılın ikinci yarısındaki çivi yazılı Akad tabletlerinde yer almış ve Cizre, Kamışlo, Amuda ve Haseke mıntıkları için kullanılmıştır. Fransız Arkeolog Thureau Dangin tarafından keşfedilen ve M.Ö. 2000 yılına dayanan, Lagaş hükümdarı Arad Nannar zamanında denk gelen iki çivi yazılı tablette 'Kardaka' ifadesi kullanılmıştır (Dangin; 'Notice Sur La Trois, eme collection de tablettes', Revue d'Assyriologie, Tom: V, no:3, 1902, ss:101). G. R. Driver'e göre bu isim ağırlıklı olarak Van Gölü'nün güney mıntıkları ile Botan Nehri'nin vadileri kastedilerek kullanılmıştır.

Romalılar döneminde Yukarı Dicle Nehri vadilerini, Amid, Botan, Tur Abdin, Karadağ ve Cizre yöreleri için 'Corduênê'; İsa'dan önce 5. yüzyılda Diyarbakır ve çevresinde kalan Ammianus da, Ermenice 'Kordukh' isminin, Diyarbakır merkezli bir kullanıma sahip olduğunu söylemiştir. Yaikût Hamevî, İslam'ın ilk dönemlerinde Cizre ve çevresi için 'Bakarda' ifadesinin kullanıldığını ama Abbasiler döneminde, hicrî 250 senesinde Tağlib kabilesinden Hasan b. Ömer'e nispetle Ceziretu İbni Ömer adının kullanılmaya başlandığını yazar.

Eski Yunan ve Roma Kaynakları:

İslâm öncesi Kürt tarihinin aydınlanmasında başvurulabilecek temel kaynaklar Roma ve Yunan kaynaklarıdır. Bu kaynakların yazarları, yaşananlara şahitlik ettiğinden, kaynakların güvenilirliği yüksektir.

Herodot (M.Ö. 484-425), "Tarih" kitabında, Ahemeniş kralı I. Dara'nın (M.Ö. 521-486) ordusunda bulunan gayri nizami Kardakis/Kardoki kuvvetlerinden söz etmektedir. Ayrıca Ahemenişlere boyun eğmiş olan ve kuzeyinde Büyük Zap, güneyinde Küçük Zap, batısında Dicle Nehri bulunan Erba İlu/Erbil merkezli Hadiyab/Adiabana yönetiminden de bahsetmektedir.

Ksenefon (M.Ö. 430-399), M.Ö. 400'de yazmış olduğu "Onbinlerin Dönüşü" isimli eserinde, Aras'ın güneyinde, Van'ın batısında kalan Kardukh (Καρδοῦχος) ülkesinden ve halkı hakkında bilgi vermektedir. Ksenophon, Kardukh'ların dağda oturan savaşçı ve Pers krallarına bağlı yaşamayan özgür bir millet olduğu düşüncesindedir. Onun aktarımına göre Pers

kralı daha önce 120.000 kişilik bir orduyu Kardukh'ların üzerine göndermiş ama bunlardan hiçbiri sağ olarak geri dönememiştir. Eserde, Ksenophon'un da içinde bulunduğu 10.000 bin kişilik Yunan ordusunun Kardukh halkıyla yaptıkları savaşa da değinilmektedir. Yunan dil uzmanlarından Ali Karduxos'a göre, Ksenefon, Kürtler için kullanmış olduğu 'Kard-ukh' biçimini Ermenilerden duyup kullanmıştır. Ksenefon'un Kürtler için kullandığı 'Kard:Kürt' kelimesinde Yunanlılar 'ü' sesini söyleyemedikleri için 'a' harfiyle yazmış olup '-lar' çoğul eki için de Ermenice çoğul eki olan 'ukh' kullanmışlardır.

Yunanlı tarihçi Polybius (M.Ö.203-M.Ö.120), "The Histories/Tarihler" adlı eserinde, Selefkosların isyancı Medya satrapı Melon'un ordusunda 'Cyrtii/Kirti, Kurtii'ler olarak adlandırılan sapancılardan söz eder. Seleucia ve Babil'i alarak Kızıl Deniz'e dek tüm toprak-



lara hakim olan Melon, ardından Susa üzerine yürüse de burada başarılı olamaz. Sonunda Medya'nın güneyindeki Suriye kralı Büyük Antiochus III tarafından M.Ö. 217'de yenilgiye uğratılır. Melon'un bu isyanında özellikle sapancı kuvvetlerini oluşturan 'Cyrtii/Kirtler'e güvendiği kaydedilmektedir. Polybius, Antiochus'un ordusunda 'Cardases (Cardac'lar, Kardac'lar)'ın bulunduğunu söylemektedir.

Yunanlı tarihçi Diodorus Siculus (M.Ö. 90-M.Ö. 30) M.Ö. 66 yılında yazdığı 40 ciltlik dünya tarihi "Bibliotheca Historia (Tarih Kütüphanesi)"nde Pers Kralı Darius'un hükmettiği ülkeler arasında Kürt krallıkları 'Gordiyene' ve 'Soplene'yi de saymıştır.

Romanlı tarihçi Tito Livio/Titus Livius'un (M.Ö. 59-M.S. 17) günümüze sadece 35 cildi ulaşabilen 142 ciltlik "Ab Urbe Condita, History of Roma/Roma Tarihi"nde Selefkos İmparatoru Büyük Antiochus'un M.Ö. 190 yılında Romalılar ve Bergamalılara karşı Yunanistan'ı ele geçirmek uğruna yaptığı Magnesia muharebesinde yenildiğini ve Antiochus'un 70.000 kişilik ordusunda 'Cyrtii/Kürt' okçularının olduğunu yazmaktadır.

Strabon (M.Ö. 65-M.S.25), 17 ciltlik "Geographika/Coğrafya"sında Babil ve Asurlarla birlikte, bugün Muş-Diyarbakır arasında bulunan Sarisa, Satalka ve Pinaka şehirlerinin bulunduğu 'Gordion'dan ve bahsetmiştir. Strabon, ayrıca Gordionların Ermeniyeye, Tarsus ve Sosini/Sason' mıntıklarında da yaşadıklarını belirtmiştir: "Dicle Nehrinin bulunduğu yerler Kürtlere aittir. Gordyaei (Gordyaea) bölgesi, antiklerin 'Kardukhi' dediği yerle aynı yöredir.". Diodorus Siculus'un (m.ö. 90-m.ö. 30) Kürt krallıkları 'Gordiyene' ve 'Soplene'yi; Strabon da 'Soplene' ve 'Corduene' olarak vermektedir.

Strabon'un bahsettiği Ediabene Krallığı'ndan, M.S. 1. yüzyılda tarihçi Pliny (M.S. 23-35), 37 kitaptan oluşan "Naturalis History"de, Ediabene'den "Eskiden Carduchi (Kardukhi) halkı olarak bilinen şimdi ise Cordueni, Adiabene'yle birleşir ve önlerinde Dicle Nehri akar (Kitap: VI, 17/14 s.)" diye bahsetmektedir. Dicle Nehri'nin Ermenistan'dan başlayıp 'Kürdüstan Dağları'ndan, yine bir Kürt bölgesi olan Adiabene'den, Apameadan ve Mesene kasabasından geçtiğini yazmıştır (Kitap VI, 31s.). Kürdüstan'a 'Gordyaei (Gord Yurdu)' diyen Pliny, 'Tigris (Dicle)' adlı bölümde Dicle nehrinin Med dilinde 'ok' anlamına geldiği ve nehrin adının okun hızından aldığını, Dicle nehrinin Gordyaei dağlarından geçtiğini yazmıştır. Kafkas kapılarının ardında 'Gordyaean/Kürdüstan' Dağları'nda Valli ve Suarni diye barbar ve gaddar kabilelerin halen bulunduğunu da söylemektedir.

Plutarch (M.S. 46-120) ise, "Bioi Paralleloi/Paralel Yaşamlar" kitabında, Ermeni kralı Büyük Tigran ile Bantıs kralı VI. Misradat'ın (M.S.63-120) birlikte; Kazvin Denizi'nin güneyinde ve Ferisilerin denetiminde bulunan Medya'nın ve Fırat Nehri'nin doğusuna

döşen Zarbienus'un krallığındaki Gordionların ülkesinin ele geçirme serüveninden bahsetmiştir. Plutarch, Ermenistan kralı Tigranesin'in Kürt Kralı Zarbienusu, karısını ve çocuklarını, destek istediği Romalılar Ermenistan'a girmeden önce suikast düzenleterek öldürdüğünü ve Romalıların Zarbienus adına cenaze töreni düzenlediğini anlatmıştır. Plutarch, M.S. 115 yılında Korduene kralının adının Manisarus olduğunu yazmaktadır.

Claudius Ptolemaeus (M.S 90-M.S. 168), Diyarbakır'ın "Bagraoandene/Bekiranlılar", Antep'in "Belcana/Belikanlılar", Hakkarinin "Tigranoandene/Tiriganlılar", Elazığ'ın "Soplene/Süphanlılar", Dersim'in "Derzene", Botanlılar'ın "Bokhtanoi" aşiretlerinden söz eder. Ptolemy, 'Carduchiler/Kürtleri'i, Geliler'in aşağısında Margasiler'le Cadusiler'in topraklarına yakın bölgesinde gösterir ve daha ilerde ise 'Gordiyene/Kürdüstan' ve 'Gordyaei Dağları'ndan söz eder. Ptolemy; Polybius (M.Ö.203-M.Ö.120) ile Livio/Titus Livius'un (m.ö. 59-m.s. 17) daha önce yazmış oldukları hadiseye benzer olarak; Suriye üzerinde hakimiyet için Mısır kralı Ptolemy III ile M.Ö. 217 yılında yaptığı savaşta bir süre önce isyancı Medya satrapı Melon'u yenilgiye uğratan Selefkos kralı Antiochus III'ün ordusunda 'Cardaces (Cardac'la, Karda'lar)' da vardı.

Dio Cassius (M.S. 155-240), Roma tarihi üzerine yazdığı ve sadece günümüze 19 cildi kalan 80 kitaplık "Historie Romaine/Roma Tarihi'nin 68. kitabındaki 26. paragrafında 'Gordyen/Gord Yurdu (Kürdüstan)'e yer vermiştir.

Ammianus Marcellinus'un (M.S. 330-391?), 359 yılında Amid/Diyarbakır'a olan Pers saldırısından söz etmekte ve buraları 'Korduen/Kord Yurdu/Kürdüstan' olarak adlandırmaktadır.

Eutropius, "Breviarium historiae Romanae" adlı 10 ciltlik tarih kitabında, Roma İmparatoru Trajanus'un döneminde hakimiyetin sağlandığı ülkelerden biri olarak 'Corduene/Kürdüstan'a da yer verilmektedir.

Tarihçiler Kürtleri ifade etmek için 'Kard, Kord, Gord, Kirti, Kurti', Kürdüstan'ı ifade etmek için de 'Corduene, Corduaie, Cordyaeae, K/Cardu-chi, Cordueni' kullanılmıştır.

Yüzyıl	Şahsiyet	Söz Etme Biçimleri
M.Ö. 5. yy.	Herodot	Pacty (Bohti, Boran)
M.Ö. 4. yy.	Ksenefon	Kardukhi (Kürt-ler)
M.Ö. 1. yy.	Sallust, Diadorus	Corduene, Gordiyene
M.S. 1. yy.	Livy, Strabon	Cyrti, Gord
M.S. 2. yy.	Plutach, Pliny	Gordiyeni, Cordueni
M.S. 2. yy.	Ptolemy, Dio Cassius	Gordiyene, Korduene
M.S. 4. yy.	Sextus Ruf, Eutropius	Kardueni, Cardueni
M.S. 5. yy.	A. Marcellinus, J. Honor, Zasmus	Cardueni, Corduene, Cordyena, Kardueni

Eski Fars/Pers Kaynakları:

Pers Kralı Darius/Dara'nın (M.Ö. 522-486) M.Ö. 515 yılında hazırlattığı Eski Farsça, Elamice, Babilce üç dilli Behistun Yazıtları'nda Fırat Nehrinin kenarından (Dersim ve Elazığ ahalisi) 'Zazana' adında bir kasabanın olduğuna yer verilmiştir.

Sasani/Pehlewice Kaynaklar:

Sasani Devleti döneminde, III. Yezdicerd (M.S.633-651) zamanında yazılmış olan ve günümüze sadece alıntılanan kısımları ulaşan 'Hudaynâme' ile 600 yılında yazılmış olan "Karnâmag-î Ardaşîr-î Babagân/Papagin oğlu Ardaşirin Hikâyeleri"sinde Kürtlere dair bilgilere yer verilmiştir. Karnâme Erdeşir Babekan'da Sasani devleti kurucusu Ardaşir (M.S. 226-652) ile Kürt Kralı Madîg'in m.s. 226 yılında yapmış olduğu savaşa değinilir. Eserde Kürtleri ifade etmek için tekil 'Kurd/kwrt-', çoğul 'kurtân', bugünkü Ermenistan'a yakın coğrafya için de 'Mâdik (Medler)' kullanılmıştır.

1350/1971 yılında İran Tahran Üniversitesi tarih hocaları tarafından hazırlanan "HISTORICAL ATLAS OF IRAN" a göre Selecid (M.Ö. 312-64.) 'CARDUCHI', Partlar 'KORDOUENE', Sasaneler (M.S. 226-651) 'KARDUN', Tahiriler (9.yy) 'KORDESTAN'ı kullanmışlardır. Tahirilerden sonraki tarihsel aşamada 'KORDESTAN' sabit bir şekilde kullanılmaya devam edilmiştir.

(Davamı var)

Nêçîrvan Barzanî pîrozbahî li karkeran kir

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi boneya 1ê Gulanê, bi boneya Roja Kedkaran a



Cîhanî pîrozbahî li kedkar û karkeran kir û daxwaz kir ku giringî bi başkirina şert û mercên jiyana wan bê dayîn.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi boneya 1ê Gulanê, bi boneya Roja Kedkaran a Cîhanî pîrozbahî li kedkar û karkeran kir û daxwaz kir ku giringî bi başkirina şert û mercên jiyana wan bê dayîn.

Peyama Serokê Herêma Kurdistanê:

Bi helkefta 1ê Gulanê, Roja Cîhanî ya Karkeran, germtirîn pîrozbahiyên li hemû karkerên Kurdistan, Iraq û cîhanê dikim, silav li ked û westabûna wan dikim û hêviya bexteweriyê, jiyaneke xweş û serfiraziyê ji wan re dixwazim.

Di demekê da ku, ez erk û keda karkeran û rola wan ya çalak ya di proseya avakirinê û binyatdanê da bilind dinirxînim, ez tekezî li ser piştvanîya berdewam ya ji bo hemû maf û daxwazên wan yê rewa û pêwîstiya bi hebûna qanûneke pêşkeftî û modern dikim ku, aqar û jîngehek gunçayî ji kar û jiyaneke baştir ji bo çîna kedkar ya karkeran û malbatên wan pêk bîne.

Bi vê minasebetê ez sendîka û rêxistinên karkeran teşwîq dikim ku ji bo dabînkirin û parastina mafên karkeran û dabînkirina derfetên kar û pêkanîna wekhevîyê di derfetên kar da karê baştir bikin û hewlên zêdetir bidin, herwesa divê aliyên peywendîdar çavdêriya xêzanên wan karkeran bikin yê ku di dema kar da jiyana xwe ji dest daye û giringî bi baştirkirina rewşa jîn û jiyara wan bidin.

Yekê Gulanê li hemû aliyên pîroz be û bêhnedaneke aram ji bo karkeran dixwazim.

Nêçîrvan Barzanî
Serokê Herêma Kurdistanê

Ji YJA Starê çalakiyên sekvanîyê: 3 dagirker hatin cezakirin

Gerilayên YJA Starê li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê ya Zapê li dagirkeran xistin. Di encama



çalakiyên sekvanîyê de 3 dagirker hatin cezakirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da û li ser çalakiyên gerîla û êrîşên dagirkeriyê agahî parve kir. Daxuyanî bi vî rengî ye: "Herêma Şehîd Delîl a Rojavayê Zapê; 3'ê Gulanê saet di 14:20, 13:15 û 16:00 de li Qada Berxwedanê ya Girê Amediyê li dijî dagirkerên ku ketin nava liv û tevgerê çalakiyên sekvanîyê hatin kirin. Di encamê de 3 dagirker hatin cezakirin. Çalakî ji aliyê hêzên me yê YJA Starê ve hatin kirin. Êrîşên artêşa dewleta Tirk a dagirker; 1, 2, 3, 4 û 5'ê Gulanê li herêma Garê qadên Repînê, Deşta Nehlê, Dêreşê û Zêvkê 6 caran, li herêma Metînayê qada Bêşîlî 4 caran, li herêma Xakurkê Ava Lolanê û qada Kolîtê 2 caran; bi giştî 12 caran bi balafirên şer hatin bombekirin.


3, 4 û 5'ê Gulanê Qadên Berxwedanê yê Şehîd Îbrahîm, Golka, Dergelê, Girê Amediyê, Girê Cûdî, Girê Şehîd Pîrdogan, Bêşîlî û Şêlêzê bi helikopterên êrîşê û çekên giran hatin bombekirin."

Serok Barzanî pêşwazî li şandeke xwendina bilind û zanîngehên Urdinê kir

Serok Barzanî pêşwazî li şandeke xwendina bilind û zanîngehên Urdinê kir ku ji Cîgirê Wezîrê Xwendina Bilind a Urdinê Dr. Meimûn El-Dûbeî, serokên 9 zanîngehan û Konsulê Giştî yê Urdinê li Hewlêrê Dr. Fuad Mecalî.

Serok Barzanî pêşwazî li şandeke xwendina bilind û zanîngehên Urdinê kir ku ji Cîgirê Wezîrê Xwendina Bilind a Urdinê Dr. Meimûn El-Dûbeî, serokên 9 zanîngehan û Konsulê Giştî yê Urdinê li Hewlêrê Dr. Fuad Mecalî.

Di hevdîtîna de, şanda mêvan rola Serok Barzanî ya di proseya siyasî ya Herêma Kurdistanê û Iraqê û kûrkirina çanda pêkvejiyanê û pêşketina Herêma Kurdistanê de bilind nirxand. Ji bilî tezekirina li ser dostanî û peywendiyên dîrokî yê gelê Urdin û



gelê Kurdistanê, amadebûna xwe ji bo pêşxistina peywendiyên akademîk, hevkarî û hevahengiya di navbera zanîngehên her du aliyên de nîşan dan.

Her di vê hevdîtîna de, Serok Barzanî amaje bi peywendiyên dîrokî yê di navbera gelê Kurdis-

tanê û Şahnişîna Urdinê de kir û spasiya Şah Ebdullah, hikûmet û gelê Urdinê jî kir ku di qonaxên cuda de hevsozî û alîkariya gelê Kurdistanê kirine. Tekezî jî li kûrkirina peywendî û dostaniya di navbera her du aliyên di warên cûrbicûr de kir.

Temellî: Divê demildest şandeyek biçê Îmraliyê



Serokwekîlê Koma DEM Partiyê Sezaî Temellî nerazîbûn nîşanî derewa Wezareta Edaletê da û got: "Divê demildest şandeyek lêkolînê biçê Îmraliyê."

Serokwekîlê Koma Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Sezaî Temellî, bi civîna çapemeniyê ya li Meclisê lidar xist geşedanên di rojevê de nirxandin. Temellî yê Amedspor a di Koma Sor a Lîga 2'yemîn de bû şampiyon pîroz kir, wiha got: "Kesên ku digotin 'Cihekî bi navê Amedê heye' an jî 'tîmeke bi navê Amedspor heye' bawer im piştî şampiyontiyê zanîne ku Amed li ku ye." Temellî yê Cejna Hidirellez pîroz kir, di salvegera darvekirina wan de Deniz Gezmîş, Yûsûf Aslan û Huseyîn Înan bi bîr anî.

Temellî, bertek nîşanî binçavkirinê 1'ê Gulanê yê li Stenbolê da û wiha berdewam kir: "Tiştê li Stenbolê derkete holê di esasê xwe de ji bilî sûcekî mezin tiştêkî din nebû. Sûcê kîr? Sûcê Wezîrê Karên Hundir û hêzên ewlehiyê kirin. Tevî biryara Dadgeha Bilind dabû, li Saraçhaneyê 42 hezar polîs hatin peywidarkirin û hewldan bi van polîsan pîrozbahîya 1'ê Gulanê ya li Taksîmê asteng bikin. Zêdetirî 200 mirovan hatin binçavkirin, mixabin ji wan 38 hatin girtin. Em vê qebûl nakin. Em dixwazin kesên hatine girtin demildest bîrê berdan."

NERAZÎBÛN NÎŞANÎ
WEZARETA EDALETÊ DA

Temellî, bertek nîşanî bersiva

Midûriyeta Giştî ya Girtîgehan a girêdayî Wezareta Edaletê ya "tecrîd nîne" da û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Binêrin me di serlêdana xwe ya bi hemû parlamenterên xwe re li Komîsyona Mafên Mirovan a Meclisê de me diyar kir ku li Îmraliyê pêkanîna rejîmeke îstîsnaî heye. Komîsyonê nivîsa ku ji Wezareta Dadê hatiye bi heman awayî ji me re şandiye û dibêje ku; 'tecrîd nîne'. Çawa nîne? Binêrin 4 sal û meheke hevdîtina bi malbatê re nîne. 4 sal û 8 meh in hevdîtina bi parêzeran re nîne. 38 meh in agahînegirtineke mûtleq heye. Dema komîsyonê ji me re nivîs nivîsandiye; weke ku henekê bi me bike dibêje ku 'ji bo ku em bikarin qala tecrîdê bikin divê agahînegirtineke mûtleq hebe.' Ê agahînegirtina mûtleq heye. 38 meh in tu qenalên ragihandinê vekirî nînin. Tu agahî nayên girtin."

Temellî, axaftina xwe wiha domand: "Derbarê tenduristiya birêz Ocalan de em xwediye tu agahiyan nînin. Di rapora hatiye de dibêje ku 3 hefteya carekê bijîşkê dahîliyê û psîkiyatristek diçe serdana wî û li giravê rewşa wî ya tenduristiye kontrol dikin. Têkildarî vê vegerek tune ye. Ku em dizanin periyodên 3 hefteya carekê jî gelek dirêj in. Belê sedema girîng a vê tarîtiyê, bêdaletiyê û hemû krîzan tecrîda li Îmraliyê ye. Em vê edî gelek baş dizanin. Ev tecrîd zêdetirî 24 salan e didome û Tirkiye jî di nava krîzên

siyasî, bêhiqûqî û bêdaletiyeye mezin de asê maye. Ji bo ku ev rewş bi dawî bibe em careke din Komîsyona Mafên Mirovan a Meclisê vedixwînin peywîrê. Divê demildest şandeyekê lêkolînê biçê giravê."

Temellî yê qala rojeva civîna kabîneyê jî kir, ev tişt gotin: "Kabîne dê îro mamosteyên ku nayên tayînkirin bigire rojeva xwe. Û ev mijareke ku demekî dirêj li bendê ne. Hûn ê bibînin dîsa dê bi tayînkirineke gelekî kêr bende-wariyên mamosteyan neyên pêşwazîkirin. Ji ber ku çavkaniyên wan ne ji bo mamoste, kedkarên tenduristiye, karker, dikandar û cotkaran e, ji bo sermayeyê ne. Belavkirina dahatê ya li Tirkiyeyê jî baş nabe û nikarin bi xizaniyê re tîbikoşin. Ji ber vê yekê her tim êrîşî DEM Partiyê dikin. Ji ber ku dixwazin dengê heqîqetê bêdeng bikin. Ji ber ku dixwazin partiya xizanan, karkeran, kedkaran, dikandaran, mamosteyan DEM Partiyê bêdeng bikin. Ji bo ku bêdeng bikin jî DEM Partiyê bi her cure bêhiqûqiyên sûcdar dikin."

NERAZÎBÛN NÎŞANÎ
ÎDIYÊN QEYÛM JÎ DA

Temellî, bertek nîşanî îdiyên ku qeyûmê dê tayînî şaredariyan bîrê kirin da û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Mijara qeyûm, mijara şermê ye li vî welatî. Axaftina qeyûmî bêexlaqî ye. Ji ber ku îcraetên hemû qeyûman îcraetên bêexlaq in. Ez hem bi awayekî aborî hem jî bi awayekî siyasî vê bi lêv dikim. Hem vîna gel hatiye desteserkin hem jî çavkaniyên gel hatiye xespkirin. Em ji vir bang li kesên qeyûman diaxivin dikin; bi taybetî jî bang li Wezareta Karên Hundir dikin, bila ji bo serdema qeyûmanê bê lêkolînkirin bi awayekî bilez mûfetîşan peywidar bikin. Bila sedemên vê îsraf, talan û şelandinê lêkolîn bikin. Her wiha ez bang li Wezareta Xezîneyê dikim; Bi destê qeyûman gelek kar û barên ku xezîne xistiye zirarê hatine kirin. Divê xezîne jî bêyî ku dereng bimîne di vê mijarê de mûfetîşan peywidar bike."

Serok Mesûd Barzanî 62 sal berê tevî rêzên Pêşmergeyê Kurdistanê bû

PeyamaKurd – Serok Mesûd Barzanî 62 sal berê, roja 20ê Gulana 1962yan tevî rêzên

bazî û rêxistinî, bi awayekî bibandor ketin xizmeta tevgera rizgarîxwaz a niştimanî.

Sala 1983an, di Enfalê de 37 kesên ji malbata wî ligel 8000 kesên navçe û eşîra wî, ji aliyê rejîma



Pêşmergeyê Kurdistanê bû.

Serok Barzanî di 60 salên jiyana xwe ya Pêşmergeyî de, her dem nixên netewî û niştimanî parast û di hemû pile û postên xwe de eşkere kiriye ku ew şanaziyê bi Pêşmergebûna xwe dike.

Serok Mesûd Mistefa Barzanî ji malbata Barzanî ye ku malbateke olî û niştimanî ya Başûrê Kurdistanê ye û ev malbata têkoşer, zêdetirî sed-salekê ye li qada tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê têkoşînê dike.

Xebata malbata Barzanî bi rêbertiya Şêx Ebduselam Barzanî yê Yekem û Şêx Mihemed Barzanî û Şêx Ebduselam Barzanî yê Duyem û heta Şêx Ehmedê Barzanî bandoreke mezin li ser tevgera rizgarîxwaz a seranserê Kurdistanê kir.

Bi rêbertiya Mela Mistefa Barzanîyê Nemir şoreşa Barzan derbasî qonaxeke berfirehtir û pêşketîtir bû û partî û sazîyên ser-

Serok Barzanî di 16ê Tebaxa 1946an de, li bajarê Mehabada paytexta Komara Kurdistanê jidayîk bûye, ev jî heman roj e ku Yekemîn Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li bajarê Bexdayê hat lidarxistin û General Mistefa Barzanîyê Nemir weke Serokê Partiyê hat hilbijartin.

Bi destpêka êrîşa artêşa Iraqê ya li ser Başûrê Kurdistanê, roja 11ê Îlona 1961ê, bi neçarî xwendinê bi cih dihêle û roja 20ê Gulana 1962yan tevî rêzên hêzên Pêşmerge dibe.

Di navbera salên 1976 – 1979an de li Amerîkayê di xizmeta bavê xwe Serok Mela Mistefa Barzanî de bû ku bi mebesta tedawiya nexweşiya xwe, li Amerîkayê bû.

Serok Barzanî di sala 1979an de di Kongreya Nehem a Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) de, ji aliyê nûnerên kongreyê ve weke serokê partiyê hat hilbijartin.

Sedam Husên ve li biyabanên naverast û başûrê Iraqê hatin jinavbirin û di gorên bikom de hatin wendakirin.

Di Raperîna sala 1991ê de rêberê meydanî yê ber bi Kurdistanê bû û plana derxistina hêzên Iraqê ji Başûrê Kurdistanê danî.

Di 7ê Nîsana 1991ê de li derbenda Korê serperîstiya hêzên Pêşmergeyê Kurdistanê kir ku tê de Pêşmerge destaneke mezin û dîrokî tomar kir û êrîşa hêzên Beisê ya li Korê tîk bir, Destana Korê werçerxaneke dîrokî bû di xebata berxwedan û rizgarîxwaz a gelê Kurdistanê de.

Serok Mesûd Barzanî di sala 1965an de zewiciye û xwedî heşt zarokan e.

Serok Barzanî tevî her du zaravayên Kurmancî û Soranî yên Kurdî, zimanên Erebi, Farisî û Îngilîzî dizane û xwendina pirtûkên dîrokî, ramyarî û serbazî hez dike.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwaziya şandeke Senatoya Amerîkayê kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 4ê Gulanê pêşwazî li şandeke Encûmena Pîran a Amerîkayê kir ku ji Senator Ted Budd û Senator Johni Ernst pêk hatibû.



Di hevdîtînê de ku Balyoza Amerîkayê li Iraqê Alina Romanawsky û Konsulê Giştî yê Amerîkayê Mark Straw tê de amade bûn, pêşxistina peywendiyên dualî, pêşhatên dawî yên li Iraqê, giringiya parastina mafên destûrî û mafên darayî yên Herêma Kurdistanê hatin gotûbêjkin.

Şanda Encûmena Pîran a Amerîkayê piştewaniya xwe bo asayîş û aramiya Herêma Kurdistanê tekez kir.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî spasiya berdevamiya piştewanîkirina Amerîkayê kir, bi taybetî piştewanîkirina Pêşmerge de. Tekezî li ser giringiya çareserkirina kêşeyên di navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta federal de li ser bingeha destûrê û rêkeftinan û herwiha rêzgirtina li sîstema federalî û qewareya destûrî ya Herêma Kurdistanê kir.

Mijareke din a hevdîtînê, taybet bû bi hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê, di vê derbarê de tekezî li ser lidarxistina hilbijartinên azad, şefaf û dadperwerane, bi beşdariya hemû aliyan û parastina mafên pêkhatayan hate kirin.

Li kantona Firatê çinîna berhemên salê destpê kir

Li kantona Firatê çinîna dextl û danan destpê kir. Rêveberiya Xweser jî bi buhayekî ku bi dilê cotkarên e berhemên salê dikire.



Li Kobanê û gundewarên palehiyê destpê kir. Nîsk, nok, kemûn, colik û dextlûdanên ku hatine çandin, tene çinî. Kobanê jî yek ji bajarên ku bi çandiniya dextl û danê tê naskirin.

Rebûi Xelîl ku temenê xwe 70 salî bi nevi û zarokên xwe paleya nîskan dike.

Rebûi Xelîl qala bîranîn xwe yê berê û paleyê kir û got, "Danê sibehê em ji xew hişyar dibûn, hevîr distira û nan jî dipêjand. Di berbangê de jî me berê xwe dida nava erdan û dest bi paleyê dikir. Ji bîrê jî av dikşandin. Di wê demê de patos ji bo rakirina berhem tune bû, hemû tişt bi destan dihat rakirin."

Rebûi Xelîl anî ziman ku demê berê ji ber genciye pale gelekî xweş bû û got, bi paleyê re me strana hey pale pale digot.

Şênîyê ji gundê Bîr Erebe Nûredîn Şêxo jî got, "Li herêmê bêhtir ceh, genim, nîsk, colik. Kemûn û dextlûdanên heyî tê çandin. Bêhtir jî nîsk, colik, kemûn û nok bi destan tene çinî, ê din jî bi patosan. Zeviyên ku min çandin jî du şimbil me nîsk çandine, du şimbil jî colik û bi qasî şimbil û nîvekê jî nok min çandiyê. Berhemên ku tene çandin jî Rêveberiya Xweser bi miqdareke baş ji me dikire."

Hêjayî gotinê ye ku li herêmê heta niha çinîna berhemên berdevame.

Dilşad Şehab: Herêma Kurdistanê haveynê aramiyê ye



Berdevkê Serokatiya Herêma Kurdistanê Dilşad Şehab got, "Herêma Kurdistanê haveynê aramiyê ye û dê wiha jî bimîne." Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser vexwendineke fermî li Tehrana paytexta Komara Îslamî ya Îranê ye.

Nêçîrvan Barzanî dê îro bi Rêberê Olî yê Îranê Elî Xameneî, Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî û Serokê Parlamentoya Îranê Mihemed Baqir Qalîbaf re bicive.

Berdevkê Serokatiya Herêma Kurdistanê Dilşad Şehab armancên vî ziyareta Nêçîrvan Barzanî ji ajansa Rûdawê re nixand.

Dilşad Şehab li ser armanca serdana Barzanî got: "Serokê Herêma Kurdistanê di wê bîr û baweriyê de ye ku stratejiya Herêma Kurdistanê ya pêwendiyên bi

cîran re ew e ku Herêma Kurdistanê haveynê aramiyê ye û dê wiha jî bimîne.

Di navbera Îran û Herêma Kurdistanê de pêwendiyên dîrokî hene.

Dema tekoşîna li dijî dîktatoriye Îran bûbû sitara bi hezaran Îraqî û Kurdistanîyan.

Ji dema ku Herêma Kurdistanê hatiye avakirin ve di nevbêra Îran û Herêma Kurdistanê de pêwendiyêke dostane ya li gorî hîmê rêzlihevgirtinê heye.

Di vî pêwendiyê de berjewendiyên her du aliyan hatine parastin. Serokê Herêma Kurdistanê dixwaze dupat bike ku Herêma Kurdistanê nabe hêmana gêfxwarina li ser berjewendiyên cîranên me.

Îran ji bo me dewleteke girîng e. Sinorê me yê fermî heye. Pêwendiyêke me ya bihêz a bazirganî û aborî heye, herwiha pêwendiyêke me ya berdevam a dîplomasiyê heye." Dilşad Şehab li ser rola Îranê ya li herêmê jî wiha axivî: "Îran li herêmê hêzeke bibandor e û bandora wê li ser Îraq û Herêma Kurdistanê heye.

Di hemû demên zehmet de pêwendiya me ya ewil bi Îranê re bûye." Demên dawiyê, bi taybetî jî piştî êrişên Îranê yên li ser Hewlêrê pêwendiyên Îran û Herêma Kurdistanê hinekî sar bûne.

Dilşad Şehab amaje bi vî sarbûnê da û ragihand: "Dema borî hinek sarbûn çêbû, em dixwazin bi rêya vî serdana diyar bikin ku berjewendiyên me yên hevbeş ji wê sariyê mezintir in."

Nêçîrvan Barzanî û Elî Xamîneyî tekezî li ser berdewamiya hevkarîyan kir

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî duh li Tehranê bi Rêberê Olî yê Îranê Elî Xamîneyî



re civiya.

Serokatiya Herêma Kurdistanê li ser civîna Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Rêberê Olî yê Komara Îslamî ya Îranê Elî Xamîneyî daxuyaniyek belav kir.

Li gorî daxuyaniya Serokatiyê, Nêçîrvan Barzanî kêfxweşiya xwe ya dîtina Xamîneyî anî ziman û "tekezî li ser amadehî û daxwaza Herêma Kurdistanê ya ji bo bipêşxistina pêwendiyên bi Komara Îslamî ya Îranê re ya di hemû waran de kir." Nêçîrvan Barzanî herwiha "spasiya piştvanîya Îranê ya ji bo Îraq û Herêma Kurdistanê jî kir." Di hevdîtîna de her du aliyên tekezî li ser giringiya pêwendiyên Îranê yên bi Îraq û Herêma Kurdistanê re kir.

Hat ragihandin ku her du alî li ser berdewamiya aramî û berfirekirina hevkarîyên hevbeş ên Komara Îslamî ya Îranê yên Îraq û Herêma Kurdistanê re hemfikir bûn.

Di hevdîtîna de rewşa herêmê bi giştî û çend mijarên ku di berjewendiyên hevbeş de ne jî hatin gotûbêj kirin.

Denîz Gezmiş û hevalên wî hatin bibîranîn: Têkoşîna wan li Kurdistanê didome

Denîz Gezmiş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan li ser gorên xwe hatin bibîranîn. Di bîranînê de peyama: "Têkoşîna wan li Kurdistanê didome. Têkoşîna me ronî dikin û rêya me vedikin."



Ji pêşengên tevgera şoreşger a Tirkîyeyê Denîz Gezmiş, Yusuf Aslan û Huseyîn Înan di 52'emîn salvegera darvekirinê de li Goristana Karşiyaka ya Enqereyê li ser gorên xwe hatin bibîranîn. Hevserokên Partiya Wêkhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Tulay Hatîmogûllari û Tüncer Bakirhan û gelek endam û rêveberên partiyên siyasî beşdarî bîranîna ku ji aliyê rêxistinên girseyî yên demokratîk ve hat lidarxistin bûn. Tulay Hatîmogûllari ya di bîranînê de axivî, diyar kir ku Denîz qet nayên jibîrkirin û wiha got: "Ji bijîjk Hikmet Kivilcim heta Kaypakayayan, Mahîran, Denîzan, Mazlûman, Sakîneyan, Sêvêyan têkoşîna şoreşger, sosyalîst û welatparêz a ji me re hatiye hiştin bi awayekî layiqî wan em ê bidomînin. Em ê wan qet ji bîr nekin, nedin jibîrkirin. Bijî têkoşîna me ya şoreşger, bijî têkoşîna me ya rêxistinî, bijî têkoşîna me ya welatparêz."

Bakirhan jî pişt re di axaftina xwe ya bi Kurdî û Tirkî kir de ev tişt gotin: "Têkoşîna Denîz, Huseyîn û Yûsûf îro li her çar parçeyê Kurdistanê berdewam dike. Têkoşîna me ronî dikin û rêya me vedikin. Em wan bi rêzdarî silav dikin. Bila bawer bikin ku; heta ku têkoşîn encam bigire dê bidome. Weke di berxwedana Wanê de, weke li Amed, Stenbol, Îzmît, Îzmîr, weke têkoşîna kedkarên xwedî li maf, wêkhevî û azadiyê derdikevin... Em ji xwe bawer in ku dê vê têkoşînê bi ser bixin."

Nêçîrvan Barzanî: Axa me nabe çavkaniya tehdîdkirina cîranên me

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî got, "Herêma Kurdistanê nabe çavkaniya tehdîdkirina cîranên me."

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser vewendineke fermî li Tehranê ye.

Nêçîrvan Barzanî doh bi Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî, Wezîrê Karên Derve yê Îranê Huseyîn Emîr Ebdullahîyan, Rêberê Olî yê Îranê Elî Xamîneyî û Sekreterê Encûmena Bilind a Ewlehiyê ya Niştîmanî ya Îranê Elî Ekber Ehmedîyan re civiya.

Serokê Herêma Kurdistanê îro jî li Tehranê bi Serokê Parlamentoya Îranê Mihemed Baqîr Qalîbaf re hevdîtinek kir.

Nêçîrvan Barzanî piştî daxuyaniyek da çapemeniyê û pirsê rojnamegeran bersivandin.

"Ev nayê qebûl kirin"

Nêçîrvan Barzanî got, "Pêwendiyên me û Îranê kûr û dîrokî ne" û pê de çû:

"Herêma Kurdistanê nabe çavkaniya tehdîdkirina cîranên me. Ti kes nikare ji axa me êrişî Îranê bike, ev nayê qebûl kirin."

Barzanî amaje pê kir ku berjewendiyên Herêma Kurdistanê ji hemû tiştî girîngtir in û got, "Berjewendiyên Herêma Kurdistanê ji hemû berjewendiyên partîyan girîngtir in."

Nêçîrvan Barzanî da zanîn ku wî roja hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê diyar kiriye û girîng e ku hilbijartin di dema xwe de bî encamdan.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî got, "Pêwendiyên me û Îranê derbasî qonaxeke nû bûn" û amaje pê kir ku civînên wî û rayedarên Îranî gelekî baş derbas bûne. Nêçîrvan Barzanî li ser pêwendiyên Îran û Herêma Kurdistanê got: "Pêwendiyên Herêma Kurdistanê yên bi Îranê re gelekî girîng in. Ev pêwendî derbasî qonaxeke nû bûn û divê werin parastin."

Gelek xalên dîrokî hene ku me nêzîkî hev dikin.

Me jî bo çareser kirina pirs-girêkan vîneke pir micid dît, helbet pirs-girêk hene lê ya girîng ew e ku ji bo çareser kirina wan hewl bê dayîn. Herêma Kurdistanê dixwaze wekî li herêmê wekî hêmanê aramî û ewlehiyê bimîne.



Ev polîtîkaya Kurdistanê naguhere û dê wiha jî berdewam bike."

"Berpîrsiyariya min parastina berjewendiyên Herêma Kurdistanê ye"

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî biryar dabû hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê 10ê Hezîranê bî kirin.

Nêçîrvan Barzanî amaje pê kir ku wan li ser guhertina roja hilbijartinan ti biryar nedaye û hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê di civînên wî û rayedarên Îranî de nehatine rojevê.

Serokê Herêma Kurdistanê li ser giringiya hilbijartinan got:

"Divê em hilbijartinan bikin da ku em karibin xizmetê ji gelê Herêma Kurdistanê re bikin."

Divê hilbijartin nebin sedema ku Herêma Kurdistanê bêhtir parçe bibe.

Berpîrsiyariya min parastina berjewendiyên Herêma Kurdistanê ye û ez dê ji bo vê jî her tiştê pêwîst bikim."

Nêçîrvan Barzanî anî zimên ku pirs-girêkên Hewlêr û Bexdayê hatine rojeva civînên wan û got:

"Koma Îslamî ya Îranê dixwaze ji bo çareser kirina pirs-girêkan aliyên pêwendîdar bîne cem hev."

Hemû aliyên diyar kir ku ew wekî dostên Îraq û Herêma Kurdistanê dixwazin pirs-girêkên Hewlêr û Bexdayê bî çareser kirin.

Me jî ji bo çareser kirina pirs-girêkan alîkarî ji dostê xwe yê hevpar xwest."

"Me Birêz Îbrahîm Reîsî vewend Herêma Kurdistanê"

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser hevdîtina xwe û Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî jî wiha got:

"Hevdîtina min û Birêz Îbrahîm Reîsî gelekî baş bû. Ew pişt-giriyê dide ku hemû pirs-girêkên Kurdan, Herêma Kurdistanê û Îraqê bi rêya diyalogê bî çareser kirin."

Me Birêz Îbrahîm Reîsî vewend ku piştî Bexdayê were Herêma Kurdistanê. Helwesta wî erênî bû."

"Ti komên li Herêma Kurdistanê nikarin êrişî Îranê bikin"

Nêçîrvan Barzanî diyar kir ku ew û Reîsî li ser mijarên ewlehiyê jî axivîne û got:

"Ez dubare dikin, Îran cîranekî me yê girîng e. Navê wan çî dibe bila bibe ti komên li Herêma Kurdistanê nikarin êrişî Îranê bikin û dîsa vegezin nav axa me."

Em vê yekê ji bo ti cîranên xwe qebûl nakin. Di hiqûqa navneteweyî de jî cihê vê nîne."

Herêma Kurdistanê dê wekî prensîbêkê pêwendiyên xwe yên bi Tirkîye, Sûriye û Îranê re bidomîne.

Em pêwendî prensîbên hiqûqa navneteweyî ne.

Gavên gelekî baş hatine avêtin ku dê dilgiraniya Îranê kêmbikin û em ji bo çareseriyê ji binî ya vê mijarê jî di rêyê baş de ne.

Divê aliyên din jî hesabûna Herêma Kurdistanê li ber çavan bigirin û vê dikin jî.

Ez hêvîdar im vê helwesta xwe bidomînin û ev mijar di hevdîtîna Îran û Herêma Kurdistanê de careke din neyên rojevê.

"Me mekanîzmeyek ava kir"

Hemû pirs-girêk bi mekanîzmaya diyalogê çareser dibin û me jî ji bo çareser kirina pirs-girêkên xwe û Îranê mekanîzmeyek ava kir.

Ev mekanîzma dê bandoreke erênî li aborî, bazirganî çûn û hatine welatîyên Îran û Herêma Kurdistanê bike."

Dadgehê ji bo Leyla Zanayê bi hinceta 'endamtiya rêxistinê' ceza xwest



Di dozeke ku derbarê wê de hatiye vekirin de ji bo siyasîmedara Kurd Leyla Zanayê bi hinceta "endamtiya rêxistinê" cezayê girtîgehê hat xwestin.

Duh rûniştina doza ku derbarê siyasîmedara Kurd Leyla Zanayê de bi hinceta "endamtiya rêxistinê" hatiye vekirin li 27emîn Dadgeha Cezayên Giran a Enqereyê bi rê ve çû. Leyla Zanayê li dadgeha navçeya Farqînê ya Amedê ligel parêzerê xwe bi rêya sistema deng û reng beşdarî dozê bû.

Di dozê de dozger ji ber 4 axaftinên wê yên xebatên hilbijartinan ên di navbera salên 2014 û 2015an de û 3 parvekirinên medyaya civakî daxwaz kir ku Leyla Zana bi hinceta "endamtiya rêxistinê" bi cezayê girtîgehê were cezakerin û mutalaya xwe pêşkêşî dadgehê kir ku heman daxwaz di rûniştina din a dozê de jî kiribû.

Parêzerê Leyla Zanayê, Îbrahîm Çelîker jî li hemberî mutalayê û ji bo parastinê daxwaza dem kir.

Dadgehê daxwaza Leyla Zanayê û parêzerê wê qebûl kir û rûniştina dozê ji bo 2yê Tîrmehê bi paş xist.

Serok Barzanî serexweşiyê li kesûkar û heval û hevkarên Kameran Xefaf dike

Serok Barzanî di behînameyekê de radigehîne, "Bi mixabiniyeka zêde ve min wexerkirina



Pêşmerge û medyakar Kameran Xefaf bihîst". Amajeyê jî dide, "Xudêjêrazî medyakarekî jêhatî û nimûneya dilsozî û welatperweriyê bû".

Serok Barzanî di behînameyekê de radigehîne, "Bi mixabiniyeka zêde ve min wexerkirina Pêşmerge û medyakar Kameran Xefaf bihîst". Amajeyê jî dide, "Xudêjêrazî medyakarekî jêhatî û nimûneya dilsozî û welatperweriyê bû".

Serok Barzanî behînameyek ji bo wexerkirina medyakarê navdar ê Kurdistanê Kameran Xefaf belav kir ku tê de nivîsiye, "Ez serexweşiyê li malbat û kesûkar û heval û hevkarên wî dikim û xwe hevparê xema wan dibînim".

Behînameya Serok Barzanî
Bi navê Xudayê mezin û dilovan
Bi mixabiniyeka zêde ve min wexerkirina nûçeyî Pêşmerge û medyakar Kameran Xefaf bihîst.

Xudêjêrazî medyakarekî jêhatî û nimûneya dilsozî û welatperweriyê bû.

Ez serexweşiyê li malbat û kesûkar û heval û hevkarên wî dikim û xwe hevparê xema wan dibînim. Xudayê mezin canê wî şa bike û sebr û hedarê bi hemî aliyan bide.

Îna lîlah weîna îleyhî racîon
Mesûd Barzanî

Omêd Xoşnaw: Agirê bazara Qeyserî ya Hewlêrê hat kontrolkirin

Parêzgarê Hewlêrê ragihand, tîmên Berevaniya Şaristanî yekser gihîştin bazara Qeyserî ya Hewlêrê karîrê agirê kontrol bikin.



Parêzgarê Hewlêrê Omêd Xoşnaw derengê şeva borî ji rojnamevanan re ragihand, di dema vemirandina agirê de çend birîndar hene, lê xweşbextane ku zîyanên canî çênebûne.

Da zanî jî, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê bi berdewamî li ser xetê bû û dilgiraniya xwe ji dubarebûna şewata li bazarê Hewlêrê anî ziman û biryar hat dayîn ku lêkolîn di sedeman û rêgirtina li ber bûyerên bi vî rengî de bê kirin.

Omêd Xoşnaw amaje bi wê yekê kir ku belavbûna agirê ji ber xemsariya kasibkaran e ku dikanên xwe nagirin û berdeyan bi ser kelûpelên xwe de nagirin, ji ber wê yekê em ê xebatên birêxistinkirina dikanan bidomînin.

Derbarê asta zîyanan de jî Omêd Xoşnaw got, lêkolîn li ser sedema bûyerê tê kirin û dê asta zîyanan were texmînkirin û piştre eşkere bikin.

Şeva borî 05.05.2024an demjimêr 21:30ê agirê bazara Qeyserî ya Hewlêrê ket û tîmên Berevaniya Şaristanî, polîs, asayîş, tenduristiyê, Zêrevanî û Şaredariya Hewlêrê bo kontrolkirina agirê gihîştin cihê bûyerê.

Leyla Qasim'in ardından 50 yıl: Ölümümle binlerce Kürt uyanacak

İdam sehmasına götürülürken "Beni öldürün fakat şu gerçeği de bilin ki benim öldürülmemle binlerce Kürt uyanacak" demişti Leyla Qasim. 42 yıldır dilden dile dolaşan Ey Reqîp marşı ile idam sehmasına kuzeni olan Leyla'yı anlatan çocukluk arkadaşı aynı zamanda kuzeni olan Sadiye Alî Ekberiyân, "Leyla'nın mücadelesini büyütmeliyiz" dedi.

Leyla Qasim, 1952 yılında Xaneqîn'de Dalaho Qasim ve Kani'nin üçüncü çocuğu olarak dünyaya geldi. Gece yarısı dünyaya geldiğinden dolayı babası Arapça 'gece' anlamına Leyla ismini koydu. Çiftçi olan Dalaho Qasim ve Kani'nin 4 erkek çocuğu Sebih, Selam, Sefa ve Selah tek kız çocuğuydu. Babası çiftçi olup Leyla 4 yaşında iken Erbil'e taşındı ve yoksulluk içinde yaşamaya başladılar. İlkokulu Wend okulunda okuyan Leyla, derslerinde başarılıydı. Gençlik yıllarında Kürt mücadelesine ilgi duymaya başladı. Ailesi orta öğretiminde sonra 1958 yılında Bağdat'a göç etti. Dalaho Qasim yoksulluk içinde geçinmelerine rağmen kızının eğitim görmesini ve bir mesleği olmasını istiyordu. Leyla ve ailesi Kürdistan'daki gelişmeleri çok yakından takip ediyordu. Leyla çok genç yaşta sömürgeci Baas rejiminin esaretinden kurtulmak amacıyla bağımsız Kürdistan için çalışmaya karar verdi ve ideallerini gerçekleştirmek amacıyla yola koyuldu. Baas rejiminin Xaneqîn'i Araplaştırma politikaları yüzünden ailesiyle birlikte Bağdat'a taşınan Leyla Qasim, sosyoloji bölümünü kazandı. Gençlik hareketinin içinde yer alan Leyla ve arkadaşları, Kürt özgürlük mücadelesini Irak'ın başkenti Bağdat'a taşımışlardı. Bu yüzden de Saddam rejiminin hedefi haline geldiler.

Kürt halkının sesini duyurmak için uçak kaçırdı

Bağdat'ta lise öğrenimini tamamlayan Leyla, 20 yaşındayken Kürdistan Öğrenciler Birliği (YKK) ile tanıştı ve onlara destek verdi. Leyla bu dönemde peşmergelere katılma kararını verdi. Leyla peşmergelere katıldığı zaman Kürtler, özellikle Güney'de hassas bir dönemden geçiyordu. 1974'ün baharında Baas rejimi Kürtlere karşı savaş açtı. Kürt ailelerini Bağdat'tan çıkardı. Irak rejimi Qeladize kentini bombaladı. Bombalama sonucunda birçok sivil yaşamını yitirmişti. Bu dönemde Leyla Qasim'a Kürt halkının sesini dünyaya duyurmak amacıyla bir uçak kaçırma görevi verildi. Uçak kaçırma eyleminde Leyla, 4 arkadaşıyla birlikte 24 Nisan 1974'te yakalandı. Hapishanedeyken işkence ve insanlık dışı uygulamalara tabi tutuldu. Ama o asla halkına ihanet etmedi, Kürt özgürlük hareketine daima sadık kaldı. Saddam'ın emriyle Leyla ve 4 arkadaşı 13 Mayıs 1974 tarihinde idam edildi.

'Bizim ölümümüzle binlerce Kürt uyanacak'

Bir kaç gün sonra ise ailesine Leyla'nın idam edileceği haberi verildi. Ferah adında bir Kürt tutukluyu görme gerekçesiyle Ebu Greyb'e giden annesi, Leyla ile görüşme fırsatı yakaladı. İdam edilmeden önce annesiyle kısa bir görüşme fırsatı bulan Leyla, annesine şu sözleri söyledi: "Güzel annem; tasalanma, ben bir dava insanıyım artık. Kürt halkı ve Kürdistan için savaşıyorum. Dün Saddam ve beraberinde bir grup buraya geldi. Beni kandıracağını, ilkelerimden taviz vereceğimi zannediyordu. Hatta mücadeleden vazgeçmem için maddi tekliflerde bulundu. İstedğim okullarda öğretmenlik yapabileceğim vaadinde bulundu. Fakat ben bunları kabul edemeyecek kadar onurlu olduğumu, halkımı satmayacağımı söyledim. Kendimi Kürt ve Kürdistan davasına adadığımı, bu mücadele uğrunda idamı onurla karşıladığımı söylemem üzerine çılgınlaşan koca Saddam'ın ne kadar zavallılaştığını gördüm. Anne bizim ölümümüzle binlerce Kürt insanı uyanacak, özgürlük bayrağımız dal-



galanacak. Ben öldüğümde üzülmeyin, saç örgülerimden bayrak yapınlar!"

'Ölümümle binlerce Kürt uyanacak'

İdam sehmasına çıkarken henüz 22 yaşındaydı Leyla. Yargılama sırasında mahkeme hâkimine, "Beni öldürün fakat şu gerçeği de bilin ki benim öldürülmemle binlerce Kürt uyanacak. Ben Kürdistan'ın özgürlüğü yolunda canımı feda ettiğimden dolayı sevinç ve gurur duymaktayım" diyordu. İdam sehmasına giderken Ey Reqîb'i okuyordu Leyla. Kısa süren yaşamında Kürt halkının özgürlüğü ve bağımsızlığı için mücadele etti. İdam sehmasında okuduğu marş dalga dalga Kürdistan dağlarında yankılanıyordu. Kürdistan mücadelesinde yaşamını yitiren ilk kadınlardan olan Leyla, aradan 42 yıl geçmesine rağmen genç kadınlar için bir sembol olmaya devam ediyor. Dönemin zor koşullarında kendini Kürt özgürlük mücadelesine adayan Leyla, arkasından gelecek ardıllara gülmüşüyordu idam sehmasında. Kürt Özgürlük Hareketi'nde Leyla'nın idam sehmasında başlattığı direniş Kürdistan'ın dört bir yanında meşalelerin ışığında devam ediyor.

'Leyla çok canlıydı'

Leyla'nın hem çocukluk arkadaşı hem de kuzeni olan Sadiye Alî Ekberiyân, Leyla'nın mücadelesini ve çalışma tarzını anlattı. Sadiye, Leyla'nın yaşamına değinerek, "Leyla hiçbir şeyden korkmazdı, o kadar inançlı ve cesaretliydi ki ölüm onu korkutmuyordu. Her zaman öncü olmayı ve önde yürümeyi isterdi. Bu yüzden de yöresel kıyafetiyle, diliyle ve Kürt kültürü ile darağacına gitti. Kendi kültürü ve diliyle baskıcı devlet karşısına çıkan Leyla, bir Kürt kadının yapması gerektiği gibi Kürt marşını okuyarak darağacına yürüdü. Evde de ailesi ona hep destek oluyorlardı. Ben de onunla beraber hareket eden ve ona destek veren ailenin kızlarından biriydim. Ben, kız kardeşleri ve mahalleden daha birçok kadın arkadaşımız her zaman onunla gezerdik. Leyla çok fazla canlıydı" dedi.

'On binlerce Leyla mücadeledede ediyor'

Sadiye, Leyla'nın mücadelesine sahip çıkılması gerektiğine dikkat çekerek şunları söyledi: "Tüm Kürt kadınları başta olmak üzere Kürt gençlerinin de Leyla'nın mücadelesine sahip çıkması gerekir. Onların da Leyla gibi yöresel kıyafetlerine, kültürlerine, dillerine, tarihlerine, topraklarını sahip çıkmalıdırlar. Leyla bizim için mücadelesini miras bıraktı ve buna sahip çıkmalıyız. Bu ruhu kendimizde her zaman yaşatmalıyız. Leyla darağacına giderken 'Benim ölmemle binlerce Kürt uyanacak' demişti ve şimdi binlerce, on binlerce Leyla toprağına, tarihine, diline sahip çıkmak için mücadele ediyor."

NerinaAzad

Dîlok: Mînbûs û mîksera betonê li hev qelibîn...Gelek mirî û birîndar hene!

Li navçeya Îslahiyeyê ya parêzgeha Dîlokê mînbûsek û mîksera betonê li hev qelibîn, 8 kes canê xwe ji dest da û 11 kes jî birîndar bûn.


Li navçeya Îslahiyeyê ya parêzgeha Dîlokê ya Bakurê Kurdistanê mîksereke betonê û mînbûseke rêwiyên li hev qelibîn. Di encama qezayê de li gorî zanyariyên destpêkê 8 kes canê xwe ji dest daye û 11 kes jî birîndar bûne. Li gorî agahiyên, qezayê li ser rêya navçeya Îslahiyeyê ya Dîlokê û parêzgeha Hatayê rû daye, mîksere betonê û mînbûsa rêwiyên her du jî wergeriyane.

Li ser agahdarkirinê tîmên tenduristiyê çûn cihê bûyerê. Parêzgarê Dîlokê li ser bûyerê daxuyaniyek



da û ragihand ku heta niha 8 kes canê xwe ji dest daye û hejmara birîndaran jî 11 ye.

Jenosîda Dersîmê, encama felsefe-îdeolojiya damezrênê ya Dewleta Tirk e...



Ibrahim GUÇLU

Di encamê de Dersîm hat îşgal kir, kevir li ser kevir nehiştin û komkujîyeke bêsinor domandin û li Dersîmê xwîn herikî û rengê Çemê Mûnzûrê hat guhertin, sor bû.

Dewleta Tirk, li ser red û înkara mîrada Împeratoriya Osmanî ava bû. Dewlet ji aliyê burokrasiya sivîl û leşker ve ava bû. Felsefeye û îdeolojiya fermî ya dewletê, nîjadperest, otorîter, kolonyalîst, îşgalkar û îlxakkar li dijî sosyolojiya plural ya Tirkiyeyê bû.

Êw îdeoloji û felsefe ya îttîhad Terakkiyan bû. Desthilatdariya elîtekê kiribû armanc. Loma jî li dijî desthilatdariya neteweyan bû. Neteweyên li Tirkiyeyê jiyana xwe didomandin, xwediyê dewletê nebun. Elîta Dewletê ji bona xwe neteweyek ava kir. Ew neteweya jî, Neteweya Kemalîst bû. Ew neteweyên derveyî neteweya Kemalîst jî, dijmin û hebûna wan ya sosyolojîk û dîrokî jî tune hatin qebûl kirin. Ev felsefe û îdeolojiya fermî ya Dewleta Tirk, bi taybetî jî li hemberî neteweya mezin û dîrokî ya Rojhelatê Navîn neteweya Kurd ket jiyane.

Her çiqas di damezrandina Dewleta Tirk de M. Kemal Atatirk û hevalên wî ji neteweya kurd re rêzdar bûn û waad kiribûn ku herêmeke azad û xweser jî ava bibe, piştî ku Dewleta Tirk ava bû û piştgiriya Yekîtiya Sovyetan û Ewropayîyan û bi taybetî jî piştgiriya Îngilîzan wergirtin, neteweya kurd wek netew tune qebûl kirin. Encama ev siyaseta kolonyalîst û nîjadperest hemû mafên neteweyî yê neteweya Kurd xesip kir, ji

bona ku wan ji holê rake, Kurdan di nav îdeoloji û neteweya xwe ya Kemalîst de bihelîne, stratejiyeke kolonyalîst, îşgalê, îlxak û helandinê (asîmîlsasyonê) ya hişk meşand.

Ew jî bû sedam ku neteweya kurd û berpirsiyarên wan ji bona ku welatê xwe azad bikin, dewleta xwe ava bikin, zûlma Kemalîst û Dewleta Tirk dawî bîn, îzin nedin kolonîzebûn û îşgal û îlxaka Kurdistanê di sala 1919-an de li Koçgiriye dest bi serhildana neteweyî û rizgarîxwaz kirin. Ev serhildanên neteweyî heta sala 1937-an jî domand.

Dewleta Tirk, li hemberî serhildanên neteweyî yê li Kurdistanê dest bi komkujî, qirkirin, jenosîda neteweya

bû. Loma jî navê çemê Mûnzûrê di hemandem de Çemê Sor e..

Gorî biryara Dewletê tê pejirandin ku ew kesên nehatibin kûştin jî "dê gelê herêmê bê komkirin û neqlî deverek din bê kirin. Ev operasyona komkirinê wê bigre ser gundan, hem çek û sîlehan kom bike û hem jî kesên hatine komkirin sirgûnê deverên din bike".

Dîsa dê gor hesabê Dewleta Tirk tê pejirandin ku "heger em tenê bi êrîşê qîma xwe bînin wê tifik û çavkanîyên serhildanê di şûna xwe de bimînin. Loma jî divê em ew kesên ku çek bi kar anîne û tînin, di cîh de û ji binî de ji holê rakin, gundan bi tevahî wêran bikin û malbatên wan dûr bixînin"



Kurd kir. Jenosîd û komkujîjî û qirkirina Dersîmê jî beşek ji vê pêvajoyeyê ye.

Dewletê bi qirkirin-jenosîd-komkujîyan jî nikarî kurdan teslîm bigre. Bi taybetî jî nikarî li herêma Dersîmê desthilatdar be û serweriya xwe li Dersîmê ava bike.

Loma jî 87 sal berê, roja 4ê gulana M. Kemal Atatirk û Fewzî Çakmak di derbarê Dersîmê de biryara êrîşa jenosîd-komkujî- qirkirina Dersîmê bigrin.

Encama ev biryara barbar û nîjadperest û kolonyalîst, di 12ê gulana 1937ê de Dewleta Tirk Dersîmê ji bona îşgal bike, dest bi tevgera leşkerî kir. Di encamê de Dersîm hat îşgal kir, kevir li ser kevir nehiştin û komkujîyeke bêsinor domandin û li Dersîmê xwîn herikî û rengê Çemê Mûnzûrê hat guhertin, sor

Dewleta Tirk gelek aşkere, biryara jiholêrakirina Dersîmê, qirkirin-jenosîd-komkujîya Dersîmê dike biryar. Ev biryar jî pêk anî.

Li gorî belgeyên fermî, di Jenosîd-Qirkirin-Komkujîya Dersîmê de ku heta dawîya sala 1938an berdewam kir, 13 hezar û 160 Kurd hatin kuştin û 11 hezar 818 kes jî hatin sirgûnkirin.

Seyîd Riza û hejmarek kesayetên navdar ên Dersîmê 15ê Çiriya Paşîna 1937an li Xarpêtê hatin bidarvekirin lê hejmara kuştî, sirgûnî û gundên hatin wêrankirin ji daxuyaniyên fermî gelekî zêdetir e.

Divê Dewleta Tirk ji ber qirkirin-jenosîd-komkujîyê û tewanên ku li hember gelê Dersîmê û Kurdistanê kirîye, rûreş bibe û bê dadgeh kirin.

Diyarbakir, 05. 05. 2024

Serokê Herêma Kurdistanê û Serokê Parlamentoya Îranê pêşxistina peywendiyên gotûbêj kirin

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û şanda pê re îro 7ê Gulanê li



Tehranê bi Serokê Encûmena Îslamî ya Îranê Mihemed Baqir Qalîbaf re civiya.

Li gorî Serokatiya Herêma Kurdistanê, her du alî li ser giringiya hebûna peywendiyên baş di navbera Iraq û Herêma Kurdistanê bi Komara Îslamî ya Îranê re li ser bingeha cîranîtiya baş û berjewendiyên hevpar tekez kirin. Di vê derbarê de, derfet û çawaniya pêşxistina hemû warên peywendiyên û hevkarîya hevbeş di navbera her du alîyan de hatin gotûbêj kirin.

Her du alî hevber bûn ku di warên hevkarîyên bazirganî, aborî, veberhênan, çandinî, geştîyar, çand, perwerde, zanîngeh û gelek warên din de, derfeta hevkarîya hevbeş ya Komara Îslamî ya Îranê bi Iraq û Herêma Kurdistanê re heye. Ji bo vê yekê jî girîng e aliyên pêwendîdar ên her du alîyan zêdetir li ser wan kar bikin.

Di hevdîtinê de rewşa giştî ya Iraq û Herêma Kurdistanê û peywendiyên Hewlêr û Bexdayê jî hatin gotûbêj kirin.

Fermandeya Hêzên Fransayê: Hêzên Hevpeymanan piştevanîya hêza Pêşmergeyan dikin

Fermandeya Hêzên Fransayê li Herêma Kurdistanê radigehîne, "Hêzên Hevpeymanan di piro-



jeiyên perwerdeya serbazî ya pêşkeftî de alîkarî û piştevanîya hêza Pêşmergeyan Kurdistanê dikin".

Fermandeya Hêzên Fransayê li Herêma Kurdistanê radigehîne, "Hêzên Hevpeymanan di pirojeyên perwerdeya serbazî ya pêşkeftî de alîkarî û piştevanîya hêza Pêşmergeyan Kurdistanê dikin".

Birêveberê Çaksaziyê li Wezareta Pêşmerge Lîwa Nebez Selah duh (Pêncşem, 02.05.2024) bi Şewirmendê Serbazî yê Artêşa Fransayê li Fermandeya Hêzên Hevpeymanan Kolonel Leonardo Luiz Coppola re civiya.

Li dû ragehandina Wezareta Pêşmerge, di wê civînê de danûstandin li ser pêngavên Wezareta Pêşmerge ji bo bicihanîna bernameya reforma hêzan û dawî pêşveçûnên piroseya çaksaziyê li Wezareta Pêşmerge hatine kirin.

Her li dû wê ragehandinê, Kolonel Leonardo giringiya hêzên Hevpeymanan ji bo piştevanîya hejmareke pirojeyan ji piroseya çaksaziyê ya Wezareta Pêşmerge re nîşan da, wekî pirojeya perwerdeya serbazî ya pêşkeftî, tevî pirojeya pîzîşkî û pirojeya cênderê.

Hevpeymanîya Navdewletî li Îraqê hêzeke serbazî ye ku ji çend yekîneyên serbazî yê welatên cuda cuda li cîhanê bi serokatiya Amerîka û Brîtanyayê pêk hatiye.

Nêzî 600 serbazên Fransayê di çarçoveya operasyonên Şamalê de li Îraq û Herêma Kurdistanê ne, wekî pareke hevparîya Fransayê ji bo Hevpeymanîya Navdewletî ku li sala 2014ê ji bo şerê DAIŞê hatibû damezrandin.

Konferansa Brukselê ya ji bo piştgiriya Sûriyeyê hat lidarxistin



8emîn Konferansa Brukselê ya ji bo piştgiriya Sûriyeyê hat lidarxistin. Konferansa ji bo pêşkêşkirina piştevanîya civaka navneteweyî ya ji bo gelê Sûriyeyê, penaber û welatên ku penaberên Sûriyeyî dihewînin hat kirin. Li salona sereke ya Parlamentoya Ewropayê, nûnerên saziyên sivîl û welatên ku hîn jî xwe dostên Sûriyeyê dibînin amade bûn. Yekîtiya Ewropayê, nûnerên saziyên sivîl ên herêmên di bin kontrola Şamê de, Rêveberîya Xweser, opozîsyon û penaberên welatên cîran ên Sûriyeyê û cîhanê vexwend konferans. Rêveberê herêmî yê rêxistina mafê mirovan a Beharê Lami Mihemed got: "Em alîkariyê di warên tenduristî, xwarin û alîkariya rasterast de pêşkêş dikin.

Projeyên biçûk ên ji bo ku welatî karibin jiyana xwe berdewam bikin û gelek projeyên di warên av, paqijî û çend warê din de hene."

Nûnerê taybet ê Almaniyayê yê Sûriyeyê li ser erkê welatê xwe ji ajansa Rûdawê re axivî. "Almanya salane milyarek dolar dide gelê Sûriyeyê"

Nûnerê Almaniyayê yê Sûriyeyê Stefan Schneck anî ziman: "Bi bawerîya min siyaseta me du alî ye. Ji aliyekî ve em tekez dikin ku tenê çareserî siyasî ye û biryara 2254an heye.

Ji ber vê yekê em bi tundî bi helwesta YEyê re ne li ser sê "na" na ji asayîkirinê re û ji rakirina ambargoyê re. Di heman demê de ku proseyaya siyasî niha di rawestanê de ye, em ji bo piştevanîya xelkê kar dikin.

Ji ber vê yekê Almanya salane milyarek dolar alîkariya rasterast dide gelê Sûriyeyê. Li bakurrojawa, li bakurrojhilat û herwiha li herêmên din ên di bin kontrola rejîmê de.

Ew dê li her herêmê bi qasî 100 milyon dolaran be." Dema Cîgirê Nûnerê Neteweyên Yekbûyî Necat Ruşdî bi nûnerê Amerîka û opozîsyonê re diaxivî, çalakvanekî piştî xwe da wan û helwesta wan şermezar kir.

Necat Ruşdî û Neteweyên Yekbûyî li çareserîya krîza Sûriyeyê digerin û daxwaza lihevkerîyê dikin.

Cîgirê Nûnerê Neteweyên Yekbûyî Necat Ruşdî anî ziman: "Wekî Netewên Yekbûyî ji bilî biryara 2254 ya Encûmena Asayîşa Navneteweyî ti biryareke din li ber destê me nîne. Niha, bi her awayî, hûn nikarin kesekî neçarî çareserîyê bikin.

Berîya her tiştî îradeya siyasî ji aliyê hemû partiyên ku di nava aloziyan de cih digirin û li ser çareserîya siyasî danûstandinan dikin pêwîst e." Hemû beşdarên konferansê dizanin ku helwesta Ewropayê hatiye guhertin û piştevanîya ji bo Sûriyeyê tenê dema ku Moskow, Enqere, Washington û paytextên welatên Ewropayê nexşerêyeke çareserîya siyasî ji bo Sûriye û Rojavayê Kurdistanê xêz bikin wê derkeve holê.

Serdana Nêçîrvan Barzanî ya Tehranê di medyaya Îranê de

Serdana Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ya Tehranê di medyaya Îranê bi awayekî berfireh cihê xwe girt. Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser vewxwendineke fermî li Tehrana paytexta Komara Îslamî ya Îranê ye.

Destpêkê Nêçîrvan Barzanî û Serokomarê Îranê Îbrahîm Reîsî hevdişînek kir. Serokatiya Herêma Kurdistanê diyar kir, her du aliyan daye zanîn ku divê pêwendiyên Îranê yên bi Iraq û Herêma Kurdistanê re li gorî "hîmên cîrantiya baş, berjewendiyên hevpar, bilindkirina asta bazirganiyê û pêwendiyên aborî" werin bipêşxistin. Li hêla din, medyaya Îranê cihêkî girîng ji vî ziyaretê re veqetand. Medyaya Îranê diyar kir ku ev serdan ji bo xurtkirina pêwendiyên siyasî û aborî yên Hewlêr û Tehranê girîng e. Rojnameya "Heftî Subh"ê behsa jiyana Nêçîrvan Barzanî kir û got, "Ji bo çareseriyê pirsgrîkan tim rêya diyalogê dide ber xwe."

Rojnameya "Şerq"ê serdana Barzanî bi sernavê "Sefereke Pirarmanc" da û şîrovekarê rojnameyê Salih Zulqedir ev serdan nixand.

Salih Zulqedir diyar kir ku Serokê Herêma Kurdistanê bi armanca avakirina hevsergiştî û navbera aliyan siyasî û bi taybetî jî avakirina hevsergiştî ya Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) re çûye Tehranê. Salih Zulqedir amaje pê kir ku dê bi taybetî li ser mijarên wekî "Êrişên bi mûşekan ên li ser Hewlêrê, enerjî û çalakiyên PKK'yê yên li Herêma Kurdistanê" were sekinîn.



Rojnameya "Armanî Millî"yê amaje pê kir ku serdana Nêçîrvan Barzanî û serdana Dîrektore Gîştî yê Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî (IAEA) Rafael Mariano Grossi di heman demê de ne û got:

"Îran van rojan bi armanca bihêzkirina pêwendiyên Îranê yên bi welatên cîran û Ewropayê re bûye kêlika kesayetên navneteweyî yên navdar."

"Armanek bipêşxistina pêwendiyên aborî û siyasî ye" Rojnameya "Armanî Îmruz"ê rûpelê xwe yê ewil ji serdana Nêçîrvan Barzanî re veqetand û got: "Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî tevî çend bepsîrên pilebilind li Tehranê ye da ku li ser çend mijarên girîng bi

rayedarên Îranê re bicive.

Bipêşxistina pêwendiyên aborî û siyasî û nixandina bûyerên girîng ên li herêmê di nava van armancan de ne."

Rojnameya "Hem Mihên"ê amaje bi "girîngiya Herêma Kurdistanê ya ji bo Îranê" da û got: "Îran salane bi Herêma Kurdistanê re 5,2 milyar dolara danûstandina bazirganiyê dike. Serdana Nêçîrvan Barzanî ya Îranê dê bibe wesîleya bihêzkirina pêwendiyên her du aliyan."

Rojnameyê êrişên Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê yên bi hinceta "pêwendiyên bi Îsraîlê re" bi bîr anîn û diyar kir ku piştî van êrişên Îranê pêwendiyên her du aliyan sar bûne. Rojnameya "Ecoiran"ê diyar kir ku dê Nêçîrvan Barzanî bi rayedarên Îranê re "bûyerên herî girîng ên cihanê û pêwendiyên Hewlêr û Tehranê" binirxîne.

Ecoiranê jî behsa girîngiya Herêma Kurdistanê ya ji bo aboriya Îranê kir û diyar kir: "Her du alî tim hewl didin ku pêwendiyên xwe xurt bikin, ev serdan jî nîşaneyê vê yekê ye." Ajansa "Meşriq"ê jî amaje bi nûçeya Rûdawê ya li ser serdana kir û bi bîr anî ku Nêçîrvan Barzanî herî dawî sê sal berê çûbû Îranê û pê de çû: "Ev ziyaret ji bo bipêşvebirina pêwendiyên Îran û Herêma Kurdistanê gelekî girîng e." Malpera Tesnîmê ya ku nêzikî Supaya Pasdaran e Îranê ye jî bi awayekî berfireh behsa ziyareta Barzanî kir û da zanîn: "Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî bi bepsîrên pilebilind ên Îranê re dicive û dê behsa bûyerên li herêmê bikin. Herwiha dê ji bo bipêşvebirina pêwendiyên Hewlêr û Tehranê jî hewl bidin."

Qetliyama Dêrsimê Nayê Ji Bîr Kirin

'Biryara qetliya Dersimê, di 4'ê Gulana 1937'an de ji aliyê Lijneya Wezîran ve li Meclisa Tirkîyeyê hate dayîn, ku îro 85:ê mîn salvegera qetliyama ku wek Komkujiya Dêrsimê derbasî dîrokê bû.


Li gorî daxuyaniyên fermî 16 hezar kes li gorî daxuyaniyên gelê Dêrsimê û 70 hezar kes ku piraniya wan kal, jin û zarok bûn. Li gund, şikeft û çeman hatine qetilkirin; Bi gulebarkirin, şewitandin, bikaranîna gaza kîmyewî, hatin kuştin.

Komkujiya Dêrsimê yek ji komkujiyên di dîroka komara tirkîyê ye. Ew yeka birînek kûr êşek mezin di nav Kurdan de çê kir. Tevî ku 85 sal di serda derbas bûbe jî, ewkî îro bûbe ku di serpêhatiya her malek Dersimî de qal kirin, ne mumkûne ku ew dira-

Elewî ne. Erdnîgarîya Dersimê çiyayên asê dolên kûr û pir bi şikeftan ve tijî ye. Têkiliyên wan zêde bi dewletê re tune bû û wek otonom dijîn.

Ev yeka Osmaniyan gelek aciz dikir. Dêrsimê wek birînek seretan bi nav dikirin û digotin "Divê ev birîna bê birîn."

Loma plana qetliyama Dêrsimê ji serdema Împaratoriya Osmanî dest pê kiriye, piştî ku Komara Tirkîyê ava bû, siyaseta Osmaniyan ya li ser Dêrsimê doman. Di 25'ê Çileyapêşîn a sala 1935'an de yekemîn rapora rêveberiya parêzgeha Dersimê hatiye amadekirin û di raporê de usa tê gotin: "Operasyona leşkerî di 4'ê Gulana 1937'an de dest pê dike." Piştî vî biryarê bi deh hezaran mirov



PWK: Destpêka Jenosîda Dêrsimê 4ê Gulana 1937ê ye!

Di 87emîn salvegera destpêka Jenosîda Dêrsimê de, em Jenosîda Dêrsimê û hemû qirkirin û jenosîdên li hemberî gelê Kurdistanê pêk hatine protesto dikin û rûreş dikin.



87 sal berê, roja 4ê gulana biryara êrişê leşkerî ya qirkirina miletekî ku ji aliyê M. K. Atatürk û Fewzî Çakmak ve hatibû pejiwandin, hate dayîn. Li ser 'Biryara Heyeta Wezaretê ya Tevergera Tenqîl ya Dêrsimê' ku di 4ê Gulana 1937ê de hatibû stendin, di 12ê gulana 1937ê de hêzên leşkerî yê Cumhuriyeta Tirkîyeyê Dêrsim îşgal kir û kevîr li ser kevîr nehiştin. Di vî biryarnamê de tê gotin ku 'wê gelê herêmê bê komkirin û neqlî deverek din bê kirin. Ev operasyona komkirinê wê bigre ser gundan, hem çek û sîlehan kom bike û hem jî kesên hatine komkirin sîrgûnê devêrên din bike'.

Dîsa di biryarnamê de tê gotin ku 'heger em tenê bi êrişê qîma xwe binin wê tîfik û çavkaniyên serhildanê di şûna xwe de bimînin. Loma jî divê em ew kesên ku çek bi kar anîne û tînin, di cîh de û ji binî de ji holê rakin, gundan bi tevahî wêran bikin û malbatên wan dîr bixînin'. Bêgûman, ev biryarnamê ji ber bawerî û nasmeya wî, biryar û emrê jîholorakirina miletekî bû. Dewleta Tirkîyeyê bi navê hildana ji bo leşkeriyê beşekî mezin ji xelkê herêmê kir leşker; kesên ku dikaribûn rêberîya gelê bikin û di nav xelkê de xwedî rûmet bûn jî kom kir û ji bo pêwendiyên wan bi hevdu nemînin, ew surgûnî bajarên cûda yê Tirkîyeyê kir û ew zorgeyî 'îqameta mecbûrî' kir. Piştî wê jî operasyona qirkirinê dest pê kir û bê ku ferqeke di nav wan xîne, gelê Dêrsimê qir kir.

Serokê Asayîşa Malatyayê yê wê demê İhsan Sabrî Çağlayangîl di bîranînen xwe de îtiraf dike ku jin û zarokên ku ji zilmê fîlîtibûn û revîyabûn şikeftan, di wan şikeftan de bi "jehra mişkan" hatin qetilkirin. Jin û keçên Dêrsimê ji bo nekevin destên leşkeran xwe ji zinarên bilind davêtin cemê Munzûrê. Leşkeran hinek zarokên sêwî jî dibirin bajarên xwe û ew weke miletekî din digîhandin. Jeonsîda Dêrsimê, xekek ji siyaseta ji holê rakirina miletê Kurd e. Ev pêvajoya sala 1921ê bi şikandina berxwedana Qocgîrîyê dest pê kir û di 1937-38an bi qirkirina gelê Dêrsimê berdewam kir. Weke ku di biryarnamê de hatîye gotin, hemû cîh û warên berxwedana gelê Kurdistanê yek bi yek hatin îmhakirin.

Ji ber qirkirin û sîcên ku li hember gelê Dêrsimê û Kurdistanê kirîye, divê dewleta Tirkîyê doza lîbûrê bike û li gorî vî rastîyê gavên pêwîst bavêje. Weke gava pêşî, Dewleta Tirkîyeyê dikare bi eşkerakirina mezelen serok û rêberên tevgerên kurdan Seyid Riza, Şêx Seîd û yê din û Seîdê Nûrsî ku heta nuha bi dizî girtîye, dest pê bike. Di 87emîn salvegera destpêka Jenosîda Dêrsimê de, em Jenosîda Dêrsimê û hemû qirkirin û jenosîdên li hemberî gelê Kurdistanê pêk hatine protesto dikin û rûreş dikin. Em hemû şehîd û pakrewanên Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînin. Xebat û tîkoşîna wan dê rîya xebat û tîkoşîna miletê Kurd ya ji bo serxwebûn, azadî û demokrasîyê rohnî bike.



tên qetilkirin, jin, mêr, zarok, kal, Kurd tînin kuştin û şewitandin. Bi deh hezaran mirov tînin sîrgûnkirin, ji xaka xwe tînin derxistin. Bi deh hezaran mirov tînin sîrgûnkirin, ji xaka xwe tînin derxistin. Zarokên keç birin li malên serbazan de kirin xizmetkar û li ser xwe qeyitkirin, zarokên kur jî di dibistanê taybet ya dewlê dekirin amûrê polîtîkayên asîmîlasyonê.

Tê zanîn ku Dêrsim, hîn di serdema Împaratoriya Osmaniya de jî wek kelemek di çavê wan de be. Xelkê Dersimê him Kurd û him jî ji ola

Seyid Riza yê nemir di 15 mijdar sala 1937'an de li sêdarê didin. Yek

ji şa Kurdan ku nizanin serkirdeyên wan li ku hatine veşartin. Divê dewleta Tirkîyê wek dewlet uzra xwe bi taybet ji Dêrsimî'yan û ji gelê Kurdistanê bixwaze. Divê qebra Seyid Riza bê eşkerakirin. Elbet ev yeka Qeliyamê nade ji bîrkirin, lê piçek be jî êşa dilê xelkê aş bike. Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêd, Qetliya Dêrsimê mehkûm dike û şehîdên Qetliyamê Dêrsimê, nemir Seîd Riza û hemû şehîdên Kurdistanê bibîr tîne. 4 Gulana 2022 Federasyona Komeleyên Kurdistan li Swêd

Herêma Xorasanê li Îranê ye. Erdê wê, ji sînorê Turkmenistanê dirêjî tixûbê Afganîstanê dibe. Hejmara kurdên li Xorasanê ne diyar e. Lêkolîner qala 1 milyon 500 hezar, hinek jî dibêjin hejmara kurdên li herêmê, 2-3 milyon in. Dîroka koçberkirina kurdên Xorasanê di salên 1100-1500 (pz) de pêk hatiye. Lê hinek nivîs qala şopên kevnare yê kurda li herêmê dikin. "Zerdeşt Pêxember" li herêmê maye û ev dever jî dikeve ber xaka kevnare ya kurda. Lewma têkiliyên kurda bi herêmê re têra xwe kevn e.

Lêkolîner û nivîskarê kurd Şoreş Reşî zêdeyî 10 salan e li ser kurdên koçber kur dibe. 2 pirtûkên wî, Kurdên Koçber 1, 2 li ser pirsê belav bûne. Ew bi xwe jî ji kurdên Anadolîya navîn e. Çend caran çû Xorasanê û li wir lêkolîner giranbuharê anîn. Me, li ser rewşa kurdên Xorasanê bi nivîskar Şoreş Reşî re axifî.

- Li ser pirsê Kurdên Koçber du pirtûkên we belav bûne. Tu bi xwe ji Kurdê Anadolîya navîn e. Tu çûye Xorasanê û li ser pirsê kur bûye. Derbarê dîroka Kurdên Anadolîya navîn û Kurdên Xorasanê pispore.

Hejmara Kurdên Xorasanê çiqas e? Li kîjan bajarên Xorasanê dijîn? Hejmara gundên wan çend in û bêhtir li çi deverê kom bûne?

Şoreş REŞÎ: Spas. Min 10 salan li ser pirtûkên bi navê "Dîroka Kurdên Koçber", cîld I û II an kar kir û dî caran çûm Xorasan û Gîlanê. Kurdên Xorasan, Gîlan, navenda Anadolê û xeta Berfiratê yek in...

Wekî her beşekî Kurdistanê an jî cîhên ku kurd lê dijîn, em baş nizanin ku çiqas kurd li Xorasanê dijîn. Anku îstatîstîkek liser wê yekê li ber destên me nîne. Yê ku heyî jî ji alî dewletên dagirker vê nayên eşkerê kirin. Bê guman hinek texmîn hene. Mînak, gencên Xorasanê dibêjin: "Hejmara me sê milyon in." Hinek nivîskarên mîna R. Blaga dibêjin: "Dema çûn Xorasanê, milyonek 900 hezar bûn, Ew jî 15 heta 50 malbat bûn." Kelmullah Tevahuđî dibêje: "45-50 hezar malbat" birin. Ew jî texmîna 250 hezar kesan dike. Dîtinê îro li ser hejmara wan tîn gotin, bi min zedê realîstîstî nayên. Dema mirov kurdên li eyalata Gîlanê jî bide ser yê Xorasanê texmînî di navbera milyon niv û dû milyonan de kurd li bakûrê Îranê dijîn. Bakûrê Xorasanê bi dewletên Afganîstan û Turkmenîstanê re cîran e. Kurd li rojhilat, ji sînorê Afganîstanê bigre heta Behra Kesk û Gîlanê belav dibin. Herdû cografîya jî çiya, tazî, hişk û bêkêr e. Ji rojhilat de, Kurd li bajarên Kelat-î Nadîr, Çîranan, Deregez, Qoçan, Nîşabur, Sebzevar, Esferayn, Şîrvan, Oxaz, Bojnurd û Aşxane dijîn. Li paytexta eyalata Xorasan, bajarê Meşhedê tê gotin ku 400 hezar kurd dijîn. Di nava wê cografîyayê de mirov gundên fars, turkmen, tat jî dibîne ku ew ji bo helandine kurdan hatine bicîhkirin. Li Xorasanê pîranî Kurmanc dijîn. Lê li bajarê Kelatê kêma jî kurdên Lor peyda dibin. Li Eyalata Gîlan ku li başûrê Behra Kesk dikevê jî gelek kurd hene. Paytextê eyaletê Reşî e. Gor bawerîya min ew nav ji êla kurdê bi navê Reşî girîtiye. Li Gîlanê, li çiyayên nezîkî behre kurdên Kurmanc dijîn û piraniya wan xwe wek "Reşî" û "Emarî" binav dikin. Wekî tê zanîn Reşî li nava Anadolê û li dora Meletî, Semsûrê û gelek cîhên din jî dijîn. Emarî jî îro bi hema navî li gundên Qirşehîrê dijîn û parçên hevîn. Li herêmên bi navên Lahîcan, Şahrudan, Sefîdrud û Loşan kurdên Lek-Lor û kurdên Hewreman dijîn. Lek wek Şexbizin jî tîn zanîn ku îro li Haymana û gelek cîhên dinê Turkiyê û Xaneqînê hene. Kurdên bi zaravê Hewramî û Dimîkî jî li Gîlanê hene. Gîlan wek mûza ziman û zaravaya ne. Ji bo lêkolîneran cîhekî mûkemel e. Di nava van kurdan de: "Tat", "Gîlek", "Taliş" û komên dine biçûk jî dijîn. Dîsa nezîkî wê herême li bajarên mîna Kazvîn û Xalxalê (Celîkî dijîn ku ew li Çelîkhan, Semsûr û navênda Anadolê jî hene) jî gelek kurd dijîn.

Li herdû eyalatan nezîkî 2000 gund hene. Tenê li Xorasanê 1600 gundên kurdan hene. Lê îro ew gundana pîranî vala bûne. Dema ez di salên 2001 û 2003 an de çûm herdû herêman min dît ku gelek gund vala bûne û xelkê jî gundan barkirine bajarên mezin. Lewra li gundan kar nemaye û salên dawî gelek xela û hişkî heye û çandînişî edî nema dibe. Ji ber sedemên aborî, gundîyan barkirine. Ew polîtîka ji alî dewletê ve jî tê teşwîk kirin. Dewlet dixwazê kurd belav bibin û bîn helandin...

- **Bêhtir ji kîjan herêma Kurdistanê hatine?**
Şoreş REŞÎ: Bêhtir ji aliyê Meletî û Semûrê ne. Wê demê jiyana koçer û koçberiyê hêsantir bû û sînorê çûnûhatin û bicîhbûnê jî Çiyayê Kurmenc û Helebê heta Erzîrûm û Qersê dirêj dibû. Federasyon, êl û konfederasyonê van kurdana di navbera wê cografîyayê de diçûn û dihatin, bicîh dibûn. Lê wek navênd, mirov dikarê bibêje ku ji bajarê Semsûr ne.

Li herêmeke Xorasanê kurdên bi navê "Layîn" hene. Ew nizanin ku ji ku hatine û navê wan ji ku hatiyê. Dema mirov li nava dokumentên Osmanîyan mezê dike, li Semsûrê gundekî bi navê "Karye-î Layîn", yanê gundê Layîn dibîne. Di salên 1500 de ew gund heye û xelkê lê nîstecîh

e. Lê piştî salên 1535 an gund vala bûye û xelkê bar kiriye. Ji dokumentên dîrokî yê bi vî rengî, axaftina mirovên li herdû herêman, qereker û şexsiyeta wan dide îspat kirin ku, ew berê li wê herême jîyanê. Bi kurtî mirov dibîne ku ew ji dora Semsûrê neçarî koçê bûne. Berî wê serdemê jî, di dema Sasanîyan de (ss VI) hejmarek kurd ji alî Sîlvanê û Gîlan kurdên Gor (1148-1215 an de

Kurdên Xorasanê

Dimenek ji jiyana Kurdên koçber: Kurdên Xorasanê

dewleta Gor avakirin) birine Xorasanê. Dîsa ji Hewreman û Lekîstanê kurd çûnê herêma Gîlanê.

- **Te hinekî qal kir. Lê bi giştî Kurdên Xorasanê çi demê li wir bi cî bûne û sedemên koçberiyê çi ne?**

Şoreş REŞÎ: Di serdema Safevîyan de, cara yekemîn Şah Îsmail, kurd birin Xorasanê. Şah dizanî ku kurd şervan in û liser esasê Sersortiyê (Qizilbaş) ew giredayî şah in. Wê demê moxol û ozbekan êrîşî Xorasanê dikirin. Îsmail jî êlek e kurd bi navê "Qereman-lu" bir û wek mertal li pêşberî wan bi cîh kir. Qeremaniyan li hember Osmanîyan gelek salan şer kirin. Bajarê "Karaman" a li Anadolê, navê xwe ji wan girfî ye. Piştî dema Yildirim Beyazîd de vedigerin aliyê rojhilat û Qafqasyayê. Di heman demê de, dewleta Safevî ava bûye û Qeremanî di avakirina wê dewletê de rolek mezin lîstine. Şah wan jî wir dibe Xorasanê. Îro jî Qeremanî li bajarê Aşxanê hene. Ez du caran çûm hêla wan. Pîranî koçberin, zaravê Kurmancî diaxifin û mirovên pir şervan û egîd in. Koçberîya düyemî di serdema Şah Tehmasîp de di sala 1553 an de pêk hat. Sedema wê jî Sersortî û eskerî bû. Koçberîya dawî jî di serdema Şah Ebbas de bû. Şah bi Osmanîyan re di sala 1590 an "Peymana Stenbolê" mohr kirin û gor vê peymanê di sala 1593-94 an de 15.000 malbatên Kurd birin Xorasan. Kurd wê demê pîranî li dora Serhedê û Azarbeycanê koçber bûn û sînorên ku dagirkeran çêkirî ihlal dikirin. Biçûyan kîjan dewletê jî ew di şer de bi ser diketin. Lewma herdû împaratoriyan jî dixwestin ji kurdan rizgar bibin. Abbas soz da kurdan, ji bo xwedîkirina pez cîhekî peyde bike. Bi vî yekê kurd xapandin û birin Weramî (başûrê Tehran, îro bûye taxa Azerbeycanê) bicîh kirin. Lê piştî dû salan xapandina wî eşkere bû û derket holê, wî kurd şandin aliyê Xorasanê. Wê demê Xorasan di bin êrîşa Ozbekan de bû û şah nedî-

Kaxizekê tu bişîne ez bixwinim lê yare (Ji pirtûka Stran û Awazên A. Navîn-Ş. Reşî).
- **Li herêmê, kurd bi giştî bi çi karî mijûl in û rewşa herêma Kurda ya aborî çawa ye?**
Şoreş REŞÎ: Kurd pîranî bi maldarî, bax û cotkarîye debara xwe dikin. Xorasan cîhekî zûha, hişk, baran kêma dibarê û çiyayî ye, çandînişî kêma. Maldarîya jî merg û çêrê kêma. Di hinek newalan

de darên meywê hene ku xelk bi fêkiyan dewera xwe dike. Bi giştî Xorasan û kurdên wir gelek feqîr û hêjar in. Aborî hema hema nîne. Dewlet bi zanyarî cîhê kar an jî tiştêkî aborîya wan baştir bike ava nake. Dixwazin kurd muhtac bin û belav bibin. Dewleta Îranê jî karê narkotîkê re çavê xwe digre, serbest e. Li wir cixara kişandin şerm tê



dîtin, lê tiryakîbûna narkotîkê baş tê dîtin. Ji bo ku bi herêma Xorasanê bi Afganîstanê re sînor e, kişandin û bikaranîn ne qedexe ye. Gelek gund û kes pabendiyê kişandinê bûne. Ez bixwe bûm şahîd ku li gundan dê û bav di nava zarokan de diçûn û gelek gund bi temamî bûne êsîrê wê. Ew sucêkî mirovahiyê ye. Pêwîst e UN (Neteweyên Yekgirtî) û hêzên kurda bi pirsê mijûl bibin. Zarokên temenê wan nebûyî 10 salî jî di narkotîkê de tîn bikar anîn an jî bûne mûptela ku ji bo civaka kurd xeterekî pir mezin e. Dewleta Îranê dema tîcareta narkotîkê tê kirin (meblaxên mezin) kesan digre û îdam dike. Lê ji bo bikaranîna wê di nava ciwanên kurda de, çavên xwe

Lê xebateka bingeîn nîne. Wekî din kovara "Kurmanj" derdiket lê gelek pirsîgîrêkên wê aborî hebûn. Sazîyeka bi navê "Mûesesa Kurmancan" heye ku navênda we li bajarê Qoçanê û wêk mûzeyekê xebatê dimeşîne. Eleqa çî bi kurdên wir ve hebe kom dike û dixê nava sazîyê. Radio û TV yê ji alî dewletê ve tîn finansê kirin jî hene, lê pîranîya bernameyan bi Quran xwendine, an jî bi propaganda sistemê diçe. Wextek sînorîkirî didin stranan. Rewşa Kurdên Gîlanê xiraptir e û tu xebatên wan yê çandî û kultûrî nîn in. Ew bi asîmîlebûne re rû bi rûne.

- **Têkiliya wan bi Kurdê Kurdistanê re çawa ye?**

Şoreş REŞÎ: Ez kurdên Xorasan û Gîlanê wek "Koda reş a kurdan" binav dikim. Çawa balafirana kodên xwe reş hene, kurdên Xorasanê jî ji kurdan dûr manê û bi tena serê xwe dijîn. Ne tekîliya wan bi kurdên rojhilatê Kurdistanê re ne jî bi yê din re hene. Ji bo ku dewlet parabolan qedexê dike, nikarin TV kurdî jî mezê kin. Hevalbendên PKK têkiliyên xwe danîbûn. Wekî din ne TV, ne rojnamê, ne kovar, ne jî tiştêkî din digehê-

je ber destên wan. Di her carê ez diçûm, min gelek pirtûkên zarokan, alfabê û ziman, CD û amûrên din dibirin û hema hema li her cîhekî belav kir û dan hinek kesan ku kopya bikin û belav bikin. Pêwîst e sazî û rewşenbîrên kurd berê rexne bidin xwe. Hêzên kurd û gelê kurd dikarin gelek alîkarîyên mezin bidin xwişk û birayên xwe, kurdên Xorasanê. Di vî warî de kemasîyên mezin hene.

- **Polîtîka dewleta Îranê li hemberî wan çawa ye?**

Şoreş REŞÎ: Wek her dagirkerekî Kurdistanê, ya wan jî polîtîkayek sînsî, nankor û bi xeter e. Tenê kurdan înkâr nake, lê ji bo ku wan bihelîne çî ji dest tê dike. Eger kurd nebiyana îro cografîya Îranê wek îro nedima; qet nebe

Xorasan di nav sînorê Îranê de nedima. Kurdan ji bo Xorasanê gelek bedel dane. Lê li bajarên Xorasanê xelk mûhtacê nanê tîstî ye û peykerek mezinêkî kurd nabînin.

Di alî din de, sistema dewletê jî bo ku xelkê bihelîne hewil dide ku berê wan bide aliyê olî. Li her kolaneke mirov dikarê mizgeftêka modern bibîne û heroj civîninê olî pêk tîn. Lê ji bo rêkûpêkiya jiyana xelkê çî kar nayê kirin. Bi propagande bi vî rengî bi hezaran kurdên Xorasanê di şerê Iraqê de kuştin û an jî seqet hiştin.

Li bakûrê Xorasanê, sînorê Turkmenîstanê cîhekî pîroz heye. Dewlet propagandê dike ku "Îmamê Elî li wir şer kiriyê û paşê bûye cîhê îstîrehetê." Di dîrokê de bûyereka wiha pêk nehatiye. Dewlet rûpelên dîrokî yê nû jî derewan diafirine. Berevajî, gelek belgê û dîtin hene ku Zerdûşt Pêxember li wir jîyaye. Lê dewlet hewil dide dîroka rastîya herêmê berevajî bike...

- **Têkiliya wan û Kurdên Anadolê ji aliyê girêdana eşîr, xîzm û xwedîtiyê heye, an na?**

Şoreş REŞÎ: Di dema îro de, têkiliyên Kurdê Anadolê û Xorasanê zêde ne xurt e. Qels e. Lê girêdana me, ji aliyê êl û eşîran ve heye. Êlên li Koban, Efrîn, Çiyayê Kurmenc, Cebel el Ekrad (Lazqiyê), Mereş, Dîlok, Meletî, Semsûr, Dêrsîm, Qers, Erzîrûm, Rûsya û Navênda Anadolê yek in. Şax û bavikên koçber li Xorasan û Anadola navên eşîr û êla xwe jîbir nekirin ne. Êla min a ku navê xwe Sêvîka ye li Xorasanê 60 gundin, li Anadolê 5 gundin. Wekî din li Dêrsîm, Meletiyê jî hene. Dîsa konfederasyona me ya bi navê Reşî tê nasîn, li taveyê cografîyayê belav bûye. 120 êlên kurd li Xorasanê hene, hinek nav hatibûn guhartin jî mirov parçê wan li bakûrê Kurdistan, Rûsya, Rojava û Anadolê dibîne.

- **Pirtûkên te Dîroka Kurdên koçber 1, 2 çiqasî bala kurdên koçber kişand?**

Şoreş REŞÎ: Di pirtûka min de gelek tez, îdia û îspatên nû hene; li ser îdiayên di vî pirtûkê de niqaşên pêwîst nehatin kirin. Belavkirina pirtûkê didome. Pirtûk bi kurdî ye û gelek kes nikarin bixwînin. Beşek jî dîrokanayên kurd bi kurdî naxwînin, an berhem negihiştîye destê wan. Lewma nixandînan, rexne û niqaşên pevîst çênebûn. Ji alî kurdên koçber ve jî rewş wiha ye. Di xwendina kurdî de li paş mayî hene. Lê gor wê jî bala wan diçûnê û dixwazin bixwînin. Hewildanên wisa rê li ber fêrbûna kurdî jî vedike. Armanca min ew bû ku, ew li ser dîroka xwe ronî bibin û bi nivîsîna kurdî teşwîqî xwendina zimanê xwe bibin. Divê bê gotin ku, gavên erênî jî tîne avêtin. Li herêmê kurda, wekî kevirêkî bavêjî nava avê, pêl bi pêl kurdî di nava kurdên koçber de belav dibe û întresa wan zêdetir dibe. Xebatên hêja dibin û gelek projeyên giranbuharê pêk tîn.

Hevpeyvîn: Zarathustra Gabar ÇIYAN
FuroKurd News



wêrî herê herême. Şah, kurd birin û ew avitên nava êgir. Piştî wê demê 1594 an de, edî şerê kurd û ozbekan dest pêdike û kurd gelek wendahiyan mezin din. Şairêkî faris dibêje: "Eger mirov xaqa Meşhedê bigûvîşê dê xwîn heta Kerbelayê here..." Rastî ew xwîna kurda bû. Piştî şerên dehansalan ajofî, kurd herême ji ozbekan paqij dikin û li wir nîştêcîh dibin. Ew strana gelêrî jî şerê wê demê îfade dike ku di dema êrîşên ozbekan de jin direvandin û li bazaran difrotin:

Te dibîn û min çêrdikî lê yarê?
Li kî alî sefer dikî lê yarê?
Her derê terî min xeberke lê yare!
Dûmên girtîye serî Zengîlan û Rûbarî

Serê Tûrmên derket li alî Xîwe û Bîharê
Hemdîla min, bêrdîla min birin bazarê
Can û malî min feda serî serkarî
Min bifroşin daynin li redê wê yarê

Ez bigerim te nabînim lê yarê
Li redê te kê hisînim lê varê

digre. Di vî warî de mafên mirovan binpê dike û bernemeyêka wan ê li dij wê jî nîne.

- **Rewşa bi axaftina Kurdî çawa ye? Xebat li ser ziman, çand û dîrokê dibe, an na?**

Şoreş REŞÎ: Kurdîya kurdên Xorasanê Kurmancîya berfiratê ye. Kurdekî ji Semsûr, Çiyayê Kurmenc, Kobanê û navênda Anadolê bi rihetî dikarê fêhm bike. Hinek farisî ketiyê navê, mirov tê de tirkî û erebî jî dibîne lê dîsa jî kurdîyek zelal û paqij e. Kurdên barkirine bajarên, hefdî hefdî dikevin ber pêla asîmilasyonê. Yê tenem mezin Kurdî dizanin lê nişên nû bi farisî diaxifin. Dibistan û sistema siyasî mejiyê wan zide şûstin.

Li gundan rewş hinekî baştîre. Zîmanê bazarê hîna jî li gelek deveran Kurdî ye. Lê xeterek gelek mezin li pêş kurdan, yê li gundan dijîn heye. Xebat ferdî ne. Kesayetiyan wek Kelmullah Tewahudî (1940) jî 30 pirtûkan zedêtir nivîsî ye û xîzmê kiriye. Lê ji bo wan nivîsîn, çapkîrin û belakirîne hemî zewî û erd û xaniyê xwe firotiye. Ji van pirtûkan 7-8 li ser dîrokê ne, yê din jî li ser çand û hînerê ne. Kesên wiha vek û vek hene

Sykes-Picos Antlaşması 108 yaşında: Kürt ve Kürdistan...



İbrahim Güçlü

Kürdistan'ı bölen Sykes-Picos Antlaşması 16 Mayıs 1916 yılında yapıldı. Bugün 108 yaşındadır.

Antlaşma, Birinci Dünya Savaşı devam ederken, savaş sonrasında Dünya'nın ve özellikle Ortadoğu'nun kazanacağı statünün oluşturulması için yapılan bir anlaşmadır.

Bu anlaşmanın mucitleri, İngiltere Hükümetinin temsilcisi Mark Sykes ve Fransa Hükümetinin temsilcisi Fransoi Georger-Picot'tur. Bu nedenle de antlaşma, her iki temsilcinin soy isimlerinin bir araya getirilmesiyle tanımlanmaktadır.

Bu kişiler görünürde, Ortadoğu Halklarının Avrupa emperyalist-sömürgeci İmparatorluğu altında daha iyi koşullarda yaşayacaklarına, eğitileceklerine, medenileşeceklerine inanan üst tabakadan, aristokrasiden gelen kişiler. Oysa temel amaçları, İngiltere ve Fransa'nın nüfuz ve egemenlik alanını genişletmektir.

Antlaşmanın mucitleri ve sahipleri çok iyi eğitilmiş olduklarından aynı zamanda Orta Doğu'ya dair derin ve kapsamlı bilgilere sahipler.

Antlaşma, "Sykes-Picot ruhu" diye bir ruh, yani içselleşen parçalayıcı, milletleri ve dinleri mezheplere göre kendi içinde çok doğalmış gibi bölen ve çatıştıran bir ruh yarattı. Bu ruh ve zihniyet, milletleri sadece dışarıdan bölen bir anlaşma olmadı. Aynı zamanda, milletlerin kendi kendilerini değişik toplumsal ve sınıfsal gruplara, mezheplere, hatta milletleri kuzey ve güney, ideolojilere bölerek bir kültürel ve zihniyet belası yarattı.

Bu antlaşma gizli bir anlaşma. Bu antlaşma, 16 Mayıs 1916 yılında yapılıyor. Antlaşma İngiltere'de yapılıyor. Anlaşmanın esas tarafları, İngiltere ve Fransa'dır. Çarlık Rusya'sının da bu anlaşmanın taraflarından biri olduğu ile ilgili farklı görüşler olmasına rağmen, Çarlık Rusya'nın da anlaşmaya taraf olduğu, Çarlık Rusya'sında Ekim 1917 Bolşevik Devriminden ve Bolşeviklerin iktidarı ele geçirmesinden sonra anlaşmaya dair yaptıkları açıklama ile açığa çıkmıştı.

Bolşevikler, iktidarları döneminde Lenin bu gizli anlaşmayı deşifre ederek, antlaşmadan

çekildiklerini açıklamıştı.

Bu antlaşma yapıldığı zaman, Kürt Milleti, Osmanlı imparatorluğunun egemenliği altında yaşamını yarı-otonom bir şekilde Kürdistan'da sürdürüyordu. Devlet sahibi değildi ve egemenlik hakkını yeterince kullanamıyordu. Araplar da, aynı şekilde Osmanlı İmparatorluğunun egemenliği altında olan bir millettir. Bu nedenle, bu antlaşma yapıldığı zaman, Ortadoğu'da ve hayatı son bulacak Osmanlı İmparatorluğunda en önemli ve tarihi iki aktör olan Kürtler ve Araplar olmasına rağmen, bu antlaşmada onların iradesi hiç önemsenmemiştir.

Bu antlaşma, Osmanlı İmparatorluğu gibi bir sömürgeci imparatorluğun parçalanmasını öngörürken, yeni emperyalist-sömürgeci bir statünün tayinini İngiltere ve Fransız kontrolünde sağlamaya çalışıyordu. Başka bir ifadeyle bu antlaşma, İngiltere ve Fransa'nın emperyalist-sömürgeci sistemini Orta Doğu'ya taşıyordu.

Sykes-Picot Antlaşması, belirli bölgelerin ve ülkelerin Osmanlı İmparatorluğunun elinden çıkarılmasını, egemenlik güçlerinin el değiştirmesini öngörüyordu. Bunu yaparken, Orta Doğu ve Orta Doğu'da yaşamını sürdüren milletlerin küçük parçalara bölünmesini amaçlıyordu.

Bu nedenle Sykes Picot Antlaşması bir böl-yönet anlaşmasıdır.

Sykes Picot Antlaşması, aynı zamanda bir ekonomik nüfuz alanını da genişletmedir. İngiltere ve Fransa'nın Orta Doğu'nun başta petrol olmak üzere enerji kaynaklarını ele geçirme antlaşmasıdır.

Sykes Picot Antlaşmasını yapanların çizdiği haritaya bakıldığında zaman, genel olarak Orta Doğu'nun ve milletlerin bölünmesinin bu enerji kaynaklarına göre bir cetvelle çizilmiş gibi olduğu hemen saptanabilir.

Esas olarak da iki egemenlik alanı yarattılar: Irak, günümüzde Ürdün'ün bulunduğu topraklar ve Filistin, İngiltere etkisine; Suriye ve Lübnan da Fransız etkisine girdi.

